

# Veger

Kovara sîyasî, çandî, hunerî, dîrokî û lekolînî ya Kurden Anatolîya Navîn

❑ **Dîroka Kurdên Anatolîya Navîn**

*Şoreş Reşî*

❑ **Koma Xalîkan**

*Hevpeyvîn: Fikret Durukan*

❑ **Omêran (Tavşançalı)**

*İhsan Eken*

❑ **Hîn hêmanên hunera komîk  
di stranên me yê gelêrî de**

*Mustefa Reşîd*

❑ **Songül Dotmam...**

*Abdullah Kaya*

1

Çile-Sebat-Adar



# Veger

Kovara Kurden Anatoliya Navin

**Genel Yayın Yönetmeni:**  
Murat Alpavut

**Redaksiyon:**  
Abdullah Kaya, Ali Fuat Gürsel,  
Murat Alpavut, Roni Yıldırım,  
Şoreş Reşî, Kadir Çelik

**Adres / Navnîşan**  
Murat Alpavut  
Friedhof Str. 3  
47877 Willich / Deutschland  
Tel.&Fax: 0049 (2154) 814598  
e-mail: alpavut@t-online.de

## Temsilcilikler

**Nederland**  
R. Yıldırım  
Duindoorn Str. 19-1  
1032 cm Aden

**Östereich**  
H. Aktan  
Leuzhof Gasse 17/31  
8020 Graz

**Denmark**  
F. Durukan  
Saven C-2 1.DOR 1 HOYE  
2630 Taastrup

**Swissre**  
İ. Candan  
Ring Str. 7  
3052 Zollikofen Bern

**Sveden**  
A. Biçen  
Lammholmsbacken 35  
49 SKARHOLMEN  
STOCKHOLM

**Buha / Fiyatı**  
5,- Euro

Veger'de yayınlanan yazılar  
Redaksiyon Kurulu tarafından  
belirlenir. Yazıların sorumluluğu  
yazarlarına aittir.

Her niviskar berpîrsiyare nivisa  
xwe ye. Mafê Redaksiyone  
heye ku nivîsen ji Vegere  
re ten, serrast û kurt bike.  
Nivîsen ku ji Vegere re ten,  
ger îcap nebin ji li xwedi  
nayen vegeandin.

# Naverok / İçindekiler

<input type="checkbox"/> Destpêk	3
<input type="checkbox"/> Veger'den	4
<input type="checkbox"/> Veger'in doğuşu / <i>Murat Alpavut</i>	6
<input type="checkbox"/> Hey Mirovatî / <i>Xizan Şîlan</i>	9
<input type="checkbox"/> Ji Gûndî Buldix	10
<input type="checkbox"/> Dîroka Kurdên Anatoliyê Navîn / <i>Ş. Reşî</i>	11
<input type="checkbox"/> Neman / <i>Kilam</i>	18
<input type="checkbox"/> Zerîye / <i>Kilam</i>	19
<input type="checkbox"/> Koma Xalîkan / <i>Hevpeyvîn: F. Durukan</i>	20
<input type="checkbox"/> Onsekizinde Toprak Olmak / <i>Menaf</i>	24
<input type="checkbox"/> Tat Dervîş'in Oğlu / <i>İbrahim Candan</i>	25
<input type="checkbox"/> Cî / <i>Yaşar Kemal</i>	27
<input type="checkbox"/> Birey toplum ilişkisi / <i>A. Fuat Gürsel</i>	30
<input type="checkbox"/> Hin hêmanên hunera Komîk... / <i>M. Reşîd</i>	33
<input type="checkbox"/> Bilal Ercan ra hevpeyvîn / <i>Dilşad Nûdem</i>	36
<input type="checkbox"/> Gûndên me: Tavşançalı / <i>İhsan Eken</i>	38
<input type="checkbox"/> Umut ve Özlem / <i>Ahmet Çetinkaya</i>	42
<input type="checkbox"/> Navê Ewropa şîrînê / <i>Kilam</i>	43
<input type="checkbox"/> Şehîdan me: "Songül Dotmam..." / <i>A. Kaya</i>	44
<input type="checkbox"/> Serpêhatî / <i>Dilşad Nûdem</i>	48
<input type="checkbox"/> Kişilik insanın kendisine karşı güveni ile oluşur / <i>Memo Zana</i>	54
<input type="checkbox"/> Were Hevalo / <i>Dilşad Nûdem</i>	55
<input type="checkbox"/> Zayend / <i>Ahmet Duydu</i>	56
<input type="checkbox"/> Sewda ye ser dilê min / <i>Xizan Şîlan</i>	58
<input type="checkbox"/> Ji Dîrokê / <i>Şoreş Reşî</i>	60
<input type="checkbox"/> Metalok (Peşgotin) / <i>R. Celîkan</i>	61
<input type="checkbox"/> Ödüllü Bulmaca / <i>M. Görkem</i>	62

# DESTPÊK

**E**m koveraka û heyecan, coş û hevîyek mezin destpedikin. Ev silaw û pîrozbahîye piştî Newrozeyê! Li hemî Kurdan, bi taybetî jî li Kurdan derwaye welat ev gava teze pîroz be! Em hevî dikin û dizanin ku, ev kovara di dîroka çapamenîye Kurdan da roleka dîrokî, girîng bilîze û mora xwe li dîroke xwe. Ji bo ve jî çî desten me hat eme bikin û enerjîya xwe giştîka ji bo ve xerç bikin.

Eva biba kovereka sîyasî, çandî, edebî, hûnerî û lekolinî. Ji bo ve em tu sînoran qebûl nakin û xwe di nava çar dûvaran hepis nakin. Eva biba denge Kurdan li derwayî welat û yen kurdi navbera sînoran welata xwe yî kevn da dijîn. Her kesen ku bixwazin xwe binîn ziman dikarin binîvsîn, niqaşen demokratîk, rexneyen û peşniyaren xwe bikin, serbestin. Ev kovara gele. Herkes dikara eş, şahî, bîr û baverîya xwe bîne ser ziman. Em jî li ve baverîyadana ku, heqe (mafe) kesî tune ku, buyeren bi gel re eleqadar gor bi fikre xwe hîlbijîre. Eve ku dile xwe xwestî binîvsîne, e ku nexastî jî astenq bike.... Bi taybetî jî, bedelan ku di rîya azadîyede hatîni dayîn re kes nikara çaven xwe bigre....

Te gotin ku, serbilindîya mîletan dewlemendîya şaristanîye wî ye. Em jî bi dewlemendîye medenîyeta netewa xwe serbilindin. Le di eynî wexte de jî xemgîn in ku ev buya male dizan û herkes parçayekî je dişeqîne. Îddia me eve ku, ev dewlemendîya mîleta yî dîrokî, çandî, felsefîk, olî, hûnerî û civakî eme bi alîkarîya gele xwe derxin hole û ji dest dizan derxînin. Ji bo ve jî xebat û lekolinen cîddî li peş me ne. Di vî warîde be guman hevcedarîye me gellî me heye.

Di ve pevajoye da çima kovar? Kovaren ku heta îro derketîni em xizmetek ji bo mîlete xwe dinirxînin. Le bes nabînin; bi kemasî, teng, sist û bi teref dibînin. Em ve baverîyadana ku kovaran hata îro derketin gelî me hemû ya hembez nakirin. Ji bo ve yeke armanca mayî herî mezin hemû gelî me hembez kirin û bersiv buyîna. Em pevajoyek hassas ta derbasdîbin. Ev derfet (îmkan) in derketî hole çawa çebu? Gere em vana baş bizanin û gore ve jî, eve ji bo vî tekoşîna demokratîk cane xwe dayîn, hembere vana rez bigrin. Tu kas nukara be je e derfet ma darxist hole.



# VEGER'DEN

**Y**eni bir yayın hayatına başlamanın heyecanı, coşkusu ve umudu ile sizlere merhaba. Dünya, siyasal, ekonomik ve toplumsal bakımlardan hızla değişmektedir. Hatta yaşadığımız bu son günlerde yaşadığımız coğrafyada bile değişikliklerden söz edilmektedir. Bu değişim ve gelişmelere paralel olarak her geçen gün ekonomik, sosyal, siyasal ve kültürel sorunlara ilişkin araştırmalar ve tartışmalar da yoğunlaşmaktadır. Bizlerin de bu gelişmelerin dışında kalması mümkün değil.

Bizlerde bu noktadan hareketle böyle bir ihtiyacın oluştuğu kanısına vararak böyle bir dergiyi çıkartmaya karar verdik. Özellikle yüzlerce yıllık ülkeden kopuşun arkasındaki gerçekleri, halkımızın kültür, sanat, edebiyat, müzik alanlarındaki değerlerin ortaya çıkarılmasını sağlamak ve bunları gelecek kuşaklara aktarmak dergimizin temel espirisi olacaktır. Bu anlamda inanıyoruz ki derginiz VEGER Kürt medyasında tarihsel bir işleve sahip olacaktır. Bu arada önümüzdeki süreçte işleyeceğimiz konular arasında başta kadın, gençlik, sağlık, eğitim, alkol, uyuşturucu, spor vb. gibi temel konularında bulabileceksiniz.

Derginiz VEGER yaşama dair bütün alanları kapsayacaktır. Toplumsal, siyasal, kültürel ve araştırmaya yönelik olacaktır. Bilim "bütün olgular birbirine bağlıdır ve değişme

içindedir, nesnel gerçeği kavramak için olgular arasındaki bağlantıları ve bütünlüğü çok iyi kurmak gerekir" der. Bizlerde bilimin bu temel kıstasından hareketle içinde yaşadığımız bugünü, geleceği doğru kurmak istiyorsak geçmişin doğru tahlilini yapmak zorundayız. Kaldı ki yıllardan beri egemen güçler tarafından varlığımız bile kabul edilmiyor. İnkâr ve imha siyasetiyle karşı karşıya bulunduğumuz unutulmamalıdır. Biliniyor ki bu nedenle uzun yıllara dayanan "düşük yoğunluklu savaş" yaşandı. Bu temelde Ulusal Demokratik mücadele içerisinde bizlerinde arasından bu halkın en değerli evlatları Şahadete ulaştı. Bu derginin bir işlevi de bu halkın en değerli evlatlarının sesi, çığlığı olmasıdır.

Derginiz VEGER`in yayın politikasında her ne kadar Anadolu Kürtlerini esas alıyorsa da kendimizi sadece bununla sınırlamıyoruz. Yukarıda da belirttiğimiz gibi bilimin gerçekliğini esas alarak olgular ve olgular arasındaki bağlantıyı kurarak sorunlara yaklaşımı esas alacağız. Bu temelde sizlerin düşünceleri, yorumları, eleştirilerinize açık olduğumuzu belirtmek istiyoruz. Bu konuda herhangi bir sınırlama getirmiyoruz. Sizlerin düşünceleri, yorumları, bilgileri bizleri güçlendirecek eleştirileri eksiklerimizi, yanlışlarımızı görüp bunları aşma konusunda vesile olacaktır. Tekrar altını çizerek belirtiyoruz



her kim ki kendisini Demokratik bir çerçevede ifade etmek, tartışmalara katılmak, eleştiri ve önerilerini sunmak, düşünce ve duygularını yazmak istiyorsa bu bizleri fazlasıyla sevindirir. Bu anlamda da Demokrasi kültürünün gelişmesine katkı sunulacağı bilinmelidir.

Derginiz VEGER hakkında merak edilen bir konu da zannediyoruz ki taraflı bir dergi mi? konusu olsa gerek. Biz şunu açık bir yüreklilikle belirtmeliyiz ki binlerce köyün yakıldığı, yıkıldığı, binlerce insanımızın katledildiği, ulusal varlığımızın hala tehdit altında olduğu, dilimizin bile inkar edildiği bu hassas süreçte taraf olmayacağımız herhalde düşünülemez. Biz elbette ki Ulusal Demokratik mücadeleden yana tarafız. Yoksa kendini ülke gerçekliğinden uzak, halktan kopuk, marjinal hale getirenlerin yanında olmamız beklenemez. On yıllardır verilen amansız mücadeleye, sadece Anadolu Kürtlerinden onlarca bir bütün binlerce şahadetin anısına bağlı kalmak ahlaki olarakta, vicdani olarakta bizleri taraf olmaya zorluyor. Bunun açık olarak bilinmesinde zannediyoruz ki fayda var.

Derginiz VEGER yayın hayatını Kürtçe ve Türkçe çıkaracaktır. Ancak asıl hedefimizin süreç içerisinde Kürtçe yazıların her sayıda daha fazla artırarak günün birinde tamamen Kürtçe olmasıdır. Tabii yazıların hangi dilde olacağı konusunda okurlarımızı zorlamayacağız. Fakat inanıyoruz ki okurlarımızda bu düşüncemizi paylaşırlar, yazıların Kürtçe olması dilimizin ve kültürümüzün gelişmesine katkı sunacaktır.

Bu arada derginiz VEGER`in yayın stratejisinin sağlam bir zemine oturtmak için ve en geniş katılımı sağlamak için "Araştırma ve Danışma Konseyi" oluşturarak daha Demokratik bir dergiyi uzun vadeli ve programlı olarak çıkartmak için bu konuda kendisini önerecek arkadaşlarında bize yazmalarını rica ediyoruz.

Bu arada derginiz VEGER`in ilk etapta üç ayda bir ilerde ki süreçte aylık periyotlarla çıkarılmasını hedefliyoruz.

Toplumumuzun temel eksikliklerinden bir

tanesi de yazmamak. Oysaki yüzlerce hatta binlerle ifade edilecek üniversite bitirmiş insanlarımız bunun yanında kendisini olanaklılıklara rağmen yetiştirmiş insanlarımızın da kendi dünyalarına çekilmeleri anlaşılır bir durum değil. Dileğimiz bundan sonra tüm kesimlerin eline kalemi almaları ve bize yazmaları. Bu vesileyle Kürt tarihine, edebiyatına, sanatına, müziğine, kültürüne kısaca yaşama dair tüm alanlara katkı sağlamalarıdır.

Saygı değer okurlarımız da kabul ederler ki içinde bulunduğumuz koşullardan sadece egemen güçler sorumlu değildir. Bizlerin de sorumlulukları var. Gelişmiş ülkelerde ki toplumların düzeyine bakıldığında hayatın her alanında örgütlendiklerini görüyoruz. Doğadan tutun hayvanları korumaya kadar, ekonomiden, siyasete kadar, kadın sorunundan, gençliğe kadar hayatın bütün alanlarında örgütlendiklerini görüyoruz. Bu örgütlü mücadele onları belli bir yere getirmiş, bir çok temel sorunlarını çözmüşler. Biz Anadolu Kürtleri bu temelde de tarihin nesnellüğünden kurtulmak için yoğun bir çaba içerisinde olmak zorundayız. Bu temelde özellikle siz değerli okuyucularımızdan rica ediyoruz, resim, belge, film, yazı, eski kitap vb. gibi değerleri bize ulaştırmanız. Amaçlarımızdan bir tanesi de bu değerlerimizi kaybolmaktan kurtarıp ileride bunları bir bölge arşivi yada müze şeklinde değerlendirmek. Unutulmalı ki Mezopotomya`nın binlerce yıl öncesinde yarattığı medeniyette atalarımızın çok önemli katkıları olmuştur. Bugün insanlığın ulaştığı uygarlık düzeyi temelini geçmişte coğrafyamızdaki yaratılan medeniyetten almıştır. Bu anlamda atalarımızın yarattığı değerlere sahip çıkmak kendimize saygının gereği olsa gerek.

Yeni bir sayıda tekrar beraber olabilmek umudu ile barışın, kardeşliğin, sağlığın, adaletin egemen olduğu bir dünyada yaşamamız dileğiyle saygılarımızı sunuyoruz.

Unutmayın ki hepimiz birbirimizin sayesinde varız.

**Dergi Redaksiyonu**



# VEGER'İN DOĞUŞU

**Murat Alpavut**

**H**er yeni oluşumun doğuşu sancılı ama aynı zamanda heyecanlı bir süreçtir. Hele bu oluşum yüzyıllardır anavatanlarından, köklerinden koparılan bir halkla ilgiliyse bu heyecan kelimelerle ifade edilemez.

İç Anadolu Kürtleri yüzyıllardır yurtlarından, köklerinden uzak olarak orta Anadolu topraklarında yaşıyorlar. Ancak bu uzaklık onlar için artık sadece coğrafik bir uzaklık olmaktan öteye bir anlam taşımıyor.

Daha yakın tarihe kadar içe dönük olarak yaşayan, dili kültürü, gelenekleri, straları

dönüş, ülke, halk gerçekliğini daha yakından görme ve yaşama heyecanı Ulusal demokratik hareket saflarında yer alarak ve ülke topraklarında yeniden filizlenen bir bütünleşmeyi beraberinde getirdi.

İşte Veger, yüzyılların özlemi olan bu tarihi dönüşün ve dönüşümün kalıcılığı, geliştirilmesi, korunması, gelecek kuşaklara taşınmasına katkı sunacak bir oluşum olarak doğdu.

Sözlü anlamda çok zengin bir kültüre sahip olmakla birlikte Orta Anadolu Kürtlerinin bu kültürlerini, değerlerini yazılı anlamda kalıcılaştırma, kaynakları araştırma, bilimsel çalışmalar yapma fikri ülkede yada diğer ülkelerde yaşayan Orta Anadolu Kürtlerinin hemen hemen hepsinin ortak düşüncesi idi.


Orta Anadolu Kürtlerine yönelik tek bir yayın organı olduğu fakat "az olsun, benim olsun" anlayışı ile çıkarılan bu yayın organınınında Orta Anadolu Kürtlerini kucaklamada yetersiz kaldığı hemen hemen yapılan bütün toplantılarda dile getirilmişti.

Bu ihtiyaçtan yola çıkarak, merkezi İsveç te bulunan "Orta Anadolu Kültür Derneği" (Komala

Çanda Anatoliya Navin) yöneticileri ile birlikte Almanya'da bir toplantı düzenlenmesi kararlaştırıldı.

Dokuz Eylül İkibinbir tarihinde Almanya'nın Troisdorf kentinde düzenlenen toplantıya Almanya Avusturya İsveç İsviçre ve Hollanda dan yüze yakın insan katıldı.

Toplantı öncesinde yapılan tanışma ve konuşmalarda oldukça sıcak bir ortam vardı ve hepimiz böyle bir tarihi çalışmanın başlangıcında oldukça heyecanlıydık.



*Divan üyeleri:  
İbrahim Candan,  
Şoreş Reşî,  
Mehmet Altundağ,  
Abdullah Gezer*

ve yaşam tarzları ile kendi halk gerçekliğini yaşayan Orta Anadolu Kürtleri özellikle son yirmi yılda gelişen Modern Kürt Demokratik hareketi ve aydınlanmasıyla ulusal gerçekliğine dahada yakınlaşmış düşüncede, ruhta ve eylemde yeniden bir geri dönüşü başlatmışlardır.

Artık çocuklarına Lerzan, Berivan, Şiyar, Arjin, Civan gibi Kürtçe isimler vermektedirler.

Bu, düşüncede ruhta gerçekleştirilen geri



Toplantı saat ondörtte divan seçimi ile başladı. Daha sonra mücadele şehitleri adına yapılan bir dakikalık saygı duruşunun ardından gündeme geçildi.

Toplantı da söz alan Divan üyeleri Mehmet Altundağ, İbrahim Candan, Şoreş Reşi ve Murat Alpavut, Orta Anadolu Kürtlerinin çalışmaları, neden böyle bir yayın organına ihtiyaç duyulduğu, derginin içeriği, yayın politikasının belirlenmesi, vede süreç içerisinde Orta Anadolu Kürtlerinin çalışmalarının nasıl kurumlaşması gerekliliği konusunda konuşmalar yaptılar.

## Veger bütün Orta Anadolu Kürtlerini kucaklamalıdır

**Y**aklaşık beş saat süren toplantıda, Avrupa da ki Orta Anadolu Kürtlerinin kurumlaşması, bir yayın organına kavuşmaları konusunda toplantıya katılanların hepsi düşünce, öneri ve eleştirilerini dile getirdiler.

Çıkarılacak olan derginin bütün Orta Anadolu Kürtlerini kapsamaması gerektiğini belirten Ali Fuat Gürsel, ileriki süreçte ansiklope-

geliştirilmesini istedi.

Bu anlamda ileride İç Anadolululara yönelik bir gecenin de gerçekleştirilebileceğini söyledi.

Toplantıda söz alan Ali Akbaş arkadaş ise, İç Anadolu Kürtlerinin bugün bir Kureysi hareketi haline gelmelerini söylüyordu. Akbaş, heyecanlı ve coşkulu olduğunu ve dergide görev almak istediğini de söyledi.

Toplantının en Anamlı ve duygusal anlarının yaşandığı kısımlarından birisi de Leverkusen kentinden toplantıya katılan şehit babası Halil Çelik in konuşması sırasında yaşandı.

Kürtlerin artık korkmaması, kendilerini özgürce ifade edebilmeleri gerektiğini söyleyen Halil amca, "bizler bedel ödedik, Civanlarımız bedel ödediler. Onların mirasına sahip çıkmalıyız" dedi. Halil Çelik, bu alanda çıkan yayınlarda bu değerlere yeterince neden yer verilmediğini sorgulayarak, çıkarılacak olan bu dergide o değerlere, şehitlere de yer verilmesini istedi.

Çıkarılacak olan dergide bölgecilik vb. Anlayışlardan kaçınılması bir bütün olarak Orta Anadolulara hitap etmesi gerektiğini söyleyen Abdullah Gezer ise, özgürleşene kadar misyonlarının devam edeceğini belirtti.

Bu çalışmalarda temel sorunun genişleme ve büyüme olduğuna dikkat çeken Mehmet Tefik Demir de, Bu güne kadar ana babalarından duydukları ile kaldıklarını artık daha geniş ve bilimsel araştırma ve çalışmalara gidilmesi gerektiğini söyledi. Demir "yaklaşık onbeş yıldır mücadele içerisindeyiz. Artık bizlerde mücadelenin bize kazandırdıkları ile köklerimizle

birleşmek için çalışmalıyız" diye konuştu.

Toplantıya İsviçre den katılan İbrahim Candan, artık Avrupa da büyük oranda kalıcı olduklarını bu nedenle halkımızla ilişkimizi koparmamız gerektiğini belirtti ve yaratılan değerlere yeterince yer vermeyenlerin kırk elli yıl sonra tarihi olarak hiç bir de-



di çalışmasının yapılması gerektiğini söyledi.

Toplantıya Hollanda'dan katılan Roni Yıldırım, derginin dilinin ağırlıklı olarak Kürtçe olması gerektiğini, ileriki süreçte neler yapılabileceğini tartışarak, burada başlatılan çalışma ve örgütlenmenin bütün Avrupa da



ğerinin kalmayacağını onun için bir an önce onlarında bu değerler etrafında güç birliği oluşturması çağrısında bulundu.

Toplantıda konuşan diğer konuşmacılarda, Dergi etrafında bir kurumlaşma yaratılması, İç Anadoluya bir grup gönderilerek belgesel vb. yapılması ve medyada işlenmesi gerektiğini ifade ettiler.

Ayrıca Kültürel ve folklorik değerlerin toplanarak değerlendirilmesi, bir arşiv çalışmasına gidilmesi, Orta Anadolu Kürtleri ile ilgili seminer ve toplantılar yapılması, ülkede ki ailelerin çocuklarının eğitimi için katkıda bulunulması, şehit ailelerine destek olmak, ulusal kurumlarla diyalogları geliştirmek ve daha bir çok öneri getirildi.

Yarım saatlik bir aradan sonra devam eden ve coşkusundan hiç bir şey kaybetmeyen toplantının ikinci bölümünde Kürt şair Xızan Şilan Kürtçe bir şiirini okudu.

## Veger'in Doğuşu

Toplantının ikinci bölümünde derginin ismi için öneriler alındı. Wegerina Welat, Koçberi, Birnekırın, Duri, Denge evina me, Comnabun, Veger, Rabun, Legerin, Şiyaribun vb. önerilerin yapıldığı isim konusunda yapılan oylamada derginin isminin Rabun olması kararlaştırıldı. Fakat bu isimle iki yayın organının daha çıktığı belirtilince Derginin isminin en çok oy alan ikinci isim Veger olması kararlaştırıldı.

Veger artık doğuşunu o gün toplantıya katılanlar ve de katılamayarak yürekten desteklerini gönderenlerin öncülüğünde gerçekleştirdi.

Toplantıya katılamayan Hasan Bozlak, bir mesajla toplantıdakilere başarı dileklerini iletmişti.

İsim tespitinin ardından Veger'in ilk aşamada Redaksiyonu için adaylar tespit edildi ve katılanların oylamasına sunuldu. Baştan sona kadar demokratik bir ortamda geçen toplantı da Veger dergisinin Redaksiyonuna Abdullah Kaya, Ali Fuat Gürsel, Kadir Çelik, Murat Alpavut, Roni Yıldırım ve Şoreş Reşi seçildiler.

Redaksiyon kurulunun seçiminin hemen ardından Veger'in önümüzde ki süreçte ya-

yın politikası, geliştirilmesi, güçlendirilmesi ve daha geniş kesimlere yayılabilmesi için yirmi kişiden oluşan bir dergi danışma kurulu oluşturuldu.

Danışma kuruluna seçilen ve önerilen arkadaşlar arasında , Hasan Bozlak, İbrahim Candan, Şoreş Reşi, İrfan Koyuncu, Abdullah Gezer, Mehmet Tevfik Demir, Şevket Bakan, Kemal Erman, Hasan Yüzer, Derviş Baran, Hurşit Aktan, Bülent İzüm, Ahmet Türkmen, Feridun Yurtsever, Levent Kanat, Bilal İnal, Mehmet Altundağ, Süleyman İslambay, Mustafa Görkem, Mahir Çelik, Ziya Kılınç, Ömer Koyuncuer gibi isimler bulunuyor.

Redaksiyon kurulu ve danışma meclisinin ardından toplantı Veger'in periyodik çalışmaları, finansmanı vb. konularla devam etti.

## Basında Veger

Troisdorf da gerçekleştirilen toplantının ardından Veger'in çıkışı basında ve medya da da büyük bir ilgiyle karşılandı.

Özgür Politika gazetesinde çıkan haberler ve ardından Avusturya'nın Graz kentinde yayın yapan Radyo Mezopotamya'nın Vegerle ilgili bir programı yayınlandı. Veger dergisi redaksiyonunun hazırladığı bir bildirinin okunduğu yayının hemen ardından radyoya yoğun telefonlar gelmeye başladı.

İç Anadolu'lu bir çok Kürt radyoda ki canlı yayına katılarak Veger dergisinin çıkışından dolayı duydukları sevinci belirttiler ve dergi ile dayanışma içerisinde olduklarını ifade ettiler.

Veger, planlanan süreden biraz gecikmeli de olsa doğuşunu gerçekleştirdi.

Yazının başında da belirttiğimiz gibi ilk doğuşlar hep sancılı ama aynı zamanda heyecan vericidir.

Böyle tarihi anlamı olan bir çalışmanın ilk ürününü, ilk olmanın getirdiği eksik ve yetersizliklerle de olsa okurlarla, yurtseverlerle, bölgemizin insanlarıyla buluşmanın, Veger'i paylaşmanın sevincini, gururunu yaşıyoruz.



## Hey Mirovatî

Min bibîzin hey mirovatî!  
Îro ez di zîndana reş de  
Di navbera çar dîwarên bextreş de  
Dest û pî li min hatine girêdan  
Û girtî me  
Lê nava dilê min bi eşqa azadiyê  
Dagirtî yê  
Ez kevokê aşiyê  
Li ser çiya yên bilindim  
Ez dermanê xweşîtiye bi hevî û êvîna welatê  
xwe serbilindim.

Hey mirovatî!  
Ev çi xêrnexwazî û hovîtî yê  
Ev çi fêlbazî û durûtîyê  
Ev çi nijadperestî û cûdatî yê  
Daxwaza min aşî û biratiyê  
Li ser her welatî yê  
Te hêj kûrikê zilmê  
Ji ser xwe neavêtîyê.

Hey mirovatî!  
Ez rêber û rewşenbîrê  
Gelî mazlûman  
Ez gûla kesk û sor û zer  
Li deşt û zozanan  
Ez stranê devî hozanan  
Ez govendê li dawet û dîlanan  
Ez hebûn û dewlemendî yê ber  
dilê Xizanan.

Hey mirovatî!  
Ez azadîxwazim  
Ez aşîxwazim  
Ez mirovhezim  
Ez evîndarekî dilsozim  
Şer û kuştinê naxwazim  
Li ser cîhanê  
Dostî û biratiyê dixwazim.

Hey mirovatî!  
Ez hatime dinê, li bajarê Ruhayê  
Nirxa welatê min gelek bûhayê  
Ez ava Diclê û Feratim  
Di navbera çar dîwaran de  
Ne rihetim  
Ez jî wekî te  
Ji dîroka insanîyete hatim

Ma tu çima çaveşiyê dikî  
Li min tim û tim.  
Carina bi çavên kelû girî  
Dil li min zîz dibû  
Ji ber nehaqiyê  
Carinan bi barekî giran  
Pişt li min xûz dibû  
Ji ber nehuqûqiyê  
Min aşî û biratî dîyarî kir  
Min li hember dujminê har  
Êgîti û mêranî kir  
Lê te wek gurê devbixwîn  
Hovîtî û neyarî kir  
Carinan ketim nav ramanên kûr û kûr  
Difikirim, diponijim ji dûr û dûr  
Hêsirên çavan dibarînim hûr û hûr  
Mejî li min giran dibû  
Û diketim nav xemeke kûr  
Serê sibê şîyar dibûm bi coşekê  
Ji diwarekî diçûm koşekê  
Ez naxwazim bikim şaşiyekê  
Li ber çavên min welatê min  
Axx! Tu çuqasî xweşîkî

Gelî Kurdno!  
Werin em bi hev re rakin  
Ev çi nakokiyê  
Werin li milê xwe barkin  
Pirsgirêka dîrokîyê  
Warin em çareser bikin  
Kêşe ya Kurdîtiyê  
Ev mesela me ya hemû mirovatî yê

Çavên me dibirîqîn  
Wek stêrkên li ezman  
Bindestî ji me re nabe  
Hebûna xwe bîne ziman  
Êdî bese Kurdno bi yekbin nema zeman  
Temaşeke li dora xwe  
Li cîhanê gelî bindest neman

Hilgirin ser milê xwe vî barî  
Xilas bibin ji koledarî  
Serfirazî dixwazim bi alîkarî  
Spas dikim ji were hezar û hezar carî.

Xizan Şîlan - 14.07.2001 - Stockholm



## Ose Çavreşê Direvê

Ji gundî Hecilara mirovekî pir rind bi navê Ose Çavuş î Çavreşê yî hebiyê. Salê xwe li dorê 60 bûye. Çevuş ji gundî Buldix jinikê kiriyê ku navê vê jî Zexa Beki Dimo buye. Herdu jî çûn ser dilovaniya xwe.

Rojekê hêrse Çevuş radibê û li Zexê dexê. Pir lê dexê u serve bûkê sivê te. Radibê bi peya didê rê û terê gundê xwe; mala xalê xwe Xelilê Bekê. Malê Xelilê li nava gundê û gelek cîranê xwe henê û ê her roj terin ba hev tèn û lakirdiyan dikin.



Çavuş gotina kevna gotî: Av di golan de dawistin e genî bibin tîne bîra xwe û biryarê didê ku herê pê jinke xwe. Rojêke side radibê tere pê Zexê. Li mala Xelil dibe nîvan. Cîranê Xelil û hevalê Xelil dibinîn ku nîvane-kî wî heyê û hemî dicun mala Xelil. Nîvên bi hurmetekî mezin xeratî dikin û dest bi sohbetê dikin. Kesatîyên mîna Ose Omar, Bilê Şarikê, Mestê Usî Xelê û gelekên dino terin mala Xelil û dest bi yaraniyan dikin. Dikevin rû Çevuş û ji wir û wê de wî çav tirsîyayî dikin. Ev jî kultûrek, cezêkî civakî û peymanêka vêşartiyê. Yek ji ê Gundî Buldix:

- Mal şevitiyo te çing uso li Zexê xist?! Xar-

zîkî xwe yî ji kera û dînî he; wêra dibêjin. Çevuş te li ku bibîne ê tê bikûjê dibêje. Yekî din jî:

- Çevuşî ji jikeralixî hesina dicû; te bibînê ê bi cigî bixwe! Dibêje.

Gundî Buldix, yek ji wirde, yek ji vêda Ose cuni dikin. Osî fiqara bi kuncikê ode da dunsike û çav lê diçûrisin. Bê deng dibê. Bi çavên bi ser bin hevra dibî li dor xwe mezdikê. Gep û gûyên wî sor dibûn.

Seda zû misînî avê dixwazê ku here êlê malê. Mîsîn heytine terê tuvaletê 50 metro ji malê dûr. Xelil li benda wegera Ose dime. Ha Osî varê ha Osî varê, lê ne. Paşê xwediyê male dibêjin di tuvaletê da eceba tiştin hatê serî vî. Xelil terê nêzikî tuvaletê dibê û bang dikê iOso Oso! Tu li wirî? Tu deng jê dernakevê. Dilê Xelil dike girpê girpê; bixwe bixwe dibêje eceba Ose kriza dil derbas-kir? Bi vê tîrsê nêzikî tuvaletê dibê, nefesa xwe digre guhdar dikê, lê deng tunê. Serî xwe bi dizika di derî re dirêj dike, lê kes di hundire tuvaletê da tune.

Meraqa wî hîn zede dibe. Dikevê tuvaletê û dibînê ku tenê mîsinî li wirê, Os tune.

Xelil wirde û oda dibêze le Ose nabînê. Deh-panzdeh gavan berjêr tere, lê nabînê. Erd qeliştî û Os ketibû. Ji jêlda Silê Osî Omer dihat. Xelil:

- Silo te nîvanê me nedî? Sil:

- Yekî xerîb bû?

- Erê. Zavê me yî Hecilera ye.

- Yekî mîna wî bi ecelê berjêr diçû. Wexta ez hatim î li pêş malan bû.

Xelil bi kenkî bilind destên xwe li jinûyên xwe xistin û got: Lo va herêmana evarî merrik hundir qetîyayî kirin. Demek wî ji mana bi tuvaletê girt û ji tirsan da bin îvê.



# Dîroka Kurdên Anatoliya Navîn û Birayên Wan

## Şoreş Reşî

Xwendêwanên hêja!

Heta roja hîro di serî me gîştikan de ev pirsra ye heyê: **“Em ji ku hatin?”**. Salê min niha 40 ê; texmîn dikim ev pirsra di serî min da jî 30 salî bu giranîkê. Ji ber vê min got ezê vê meselê bikolim.. Ev edî mîna çiyakî li ber min sekînî-bû; yan ezê di ser wî çiyayî re biçûyama, yan jî ev çiyayê bi ser min de bata xarê. Min a sifte (pêşî) da ber xwe û dest bi kar kir. Min kal, jin, dîrokzan, nivîskar, kevir û çiya niştin jê pirskir û hîna jî dipirsimê û lê digirimê. Her kes li tiştêkî digirê, hen li pera, hen li zevqê, hen li êşqê, ez jî li wê tarîxê digirimê. Min tiştin dîtî an na? Erê min çend tiştên muhîm dîtî û vê yekê jî tarîxê mê û Kurdan re mina gava yekê mîn dihesibînim û dizanim ku kurikên me jê gavên din bavêjin. Ji ber vê jî niha da dinivîsnim ku mizgînên minê jî vê re hene !!!

Di her hêjmareka Veger ê da ezê ji we re binivîsnim. Ji serida ezê heynim heta roja hîro. Eva dirêj bibê, hune meraq bikin, carna jî hune bi hêrs bikevin lê ne mumkune ku ez gîştîkê di hêjmareke da binivîsnim û vê jî meraqê xelas bikim. Ji bo vê, di serî de jî vê sebrê dixwazim..

Tu iddia yê minê mîna “Tarîxa herî rind min nivisandî tunun, ez neyî dîrokzanim jî, lê mirovekî jî tariyê hez nakî mê. Heta ji destên min hat, ezê ronahiyê bidim tarîxa tarî hîştinî. Dîroka Kurdan û bi taybetî jî ê Kurdên li derwayî welat dijin karêkî giran û zehmetê. Ev karê grup û instîtuyanê; karê kesên bisporanê. Ji bo ku xortên me li pêşerojê de wî karî hîn baştir binivîsnin emê bingehêkî çekin. Yan jî di vê platforme de emê bigehêjin sentezeke...Ji bo vê ez alîkariya we jî dixwazim. Her kes bi ceseret min rexne bike, tiştên ku hûn dizanin ji me re binivîsnin, piştgiriya min bikin û pirsra ji xwe jî bikin.


Ezê nivîsên xwe bi Kurdî binivîsnim, heta ji dest min hat bi şîveyekî sivik û tenîkê jî keli-

mên (gotin) li Anatoliyê bi kar tînin ezê bi kar bînim. Ji ber ku; hunê bibînin ku berxwedana me di dîrokê numuneya ka bi serê xwe, pêvîste em vê tekoşîne ji bo zimanê xwe yî şêrîn jî bidin. Ji ber kêmasiyên rast nivîsandinê jî leborîna(ûzir) xwe dixwazim.

Di wan nivîsan de, hun jê bibînin ku min pîr bi berfirehî meselê da ber xwe. Ez çiyes bi serketim? Ev pirsêka cûdayê, lê a muhîm evê ku min bingeh fireh danî, tarix kûr kola, dest bi xanî çekirinê jî kir lê mumkune ku xaniyê min jî kerpîçan bê..Ez hêvîdarim ku xortên me jê wî xanî ji betong û hesinan ji nû vê çekin. Ez rê wedikim, kuweta (hêz) min têrî vê kir, ev jî ma tamam bikin.

### DESTPÊKA MIROVATIYÊ

Zanîn û şaristaniya (medeniyet) hîro ye dibêje: Mirovatî ye li Afrîka dest pêdikê. Li rojhilatê Afrîka bi gîştî, bi taybetî jî li Kenya(Laetoli) û Etiyopya ye, di navberê 6-1 milyon salan de dest pêdike. Ev tarîxa mumkune ku di demeka din de bê guhartin jî. Loma, her roj tiştên êcerê(nû) derdikevinê û



*Iskeletê mirovên cara sifê ji pevajo maymunan derbasi mirovatiyê bûnî*





Belavbûna mirovatîyê û cihên ku di bin buzê de (3)

tarixê ser û bin dibe...Wek mînak: Berê dihatê qebug kirin ku, 4 milyon sal berê, pêvajoya (surec) ya ji meymun derbasê mirov bûnê pêk hatiyê. Lê di salên dawî de, bi kolanên nû ev derketê 6 milyon sal. So (sibê) belki ev bibê 8 milyon sal?

Îro te qebug kirin ku, Berî Mîlade (BM) di navbêrê salên 1.8 milyon - 90 000 de mirovatîyê ji Afrîka bervê jor hildikişê. Di nava Misirê de dibê du şeqa: Yekê bervê Kurdistan û Çîn terê. Ê din jî bervê Fas û Ispanya.

Di belavbûna mirovatîyê de, rola îklîmê bê guman neyê mineqaşê kirin. Xelkê ji bo cihên ku; xwarina xwe zêde, germ, avê xwe pir û ewle (emniyet) her tim şûn digerin. Rola pîrbûna nûfûsê jî pêwîste neyê ji birkirin. Ji ber sedêmen ku xeta joriya cihanê, yanê: Skandinavya, welatên Baltîq, Rusya, Bakûrê Çîn û Kafqasya yê di bin buzê de bûn, xelk nedîçû wan deran. Yanî tê texmîn kirin ku dunya 12 hezar sal BM zedetir germ bû. Ji ber vê, mirovatî ye li başûrê Avrûpa, Anatoliyê, Kurdistan, Mezopotamya, Misir û Çînê kom dibê.

Di vê kombûn-cih bûna mirovatîyê de, tişteki dinî balkeş jî serhêjmar (nufus) mirovanê (1). Eger em bala (dikkat) xwe bidin nufusê dema 4000 sal BM, emê bibînin ku hêjmar miroven li sinûrên Kurdistanê ji her alî dînyayê zedetirin. Yanî ji mirovên ji Çîn jî pirtirê. Vê demê li Hindistanê hîn kes tune. Nispêta (oran) pîrbûna mirovan tenê li Kurdistan, Mezopotamya û Misirê wek hevê. Yanî dayika mirovatîyê ev herêmana û her sê çemin...Ev jî îspatêkê ku, Kurd ji tu deran nehatin Kurdistan û ev nufûsa pira li wir, bervê welatên din belav bû...

Dr. Cemşîr Bender dibêje, "Kurd li Zagrosan derketin holê"(5) û vê herêma pir fireh tarif dikê. Bi dîtina min, Kurd li mintiqên çiyayî derneketin holê, ji dora çêman mecbûrî çiyayî bûn û ji ber parastina xwe derketin çiya. Ev şaristaniya ku li dora çêman ava kirin jî xelk li ser rûnişt û kirin male xwe. Ğ hêdî hêdî Kurd ji ber wana vekişîn çiyayî. Mirov dikarê bibêje ku, ev belgeyên ku li


mintiqên çiyayî derketin holê malê tenê Kurda ne. Ji ber ku, xêr ji Kurdan tu mîletên din li çiyayî jîyan nekirin. Lê evên li Mezopotamya derdikêvin ji malê hemû gelanê; yanî sentezin. Yekê jî, pêwîste em Anatoliya Navîn, Çukuroava, Rojhilatê Behra Sipî, Xorasan jî texin nava tarîfa ku cihên Kurd lê cara yekêmin bi cih bûne. Yanî welatê Kurd û pîsmamên Kurdane.

Li aliyê din, iddîayên kû Kurd ji Skandinavya hatine(2) bê bîngehin. Berêqse vê, wekî rektorê bereyî Universîte UmeÂ Prof. Lars Bâcman ê Swedî, di lêkolînê kirî de encamên balkêş derxistin holê. Di lêkolîna ku li ser DNA ye 1007 kesên niha li Avrûpa hatî kirin de derket holê ku ji sedî heştê (100/80) kesî kromozonê xwe ji rojhilata Navîn tenê!!! Yanî, ji 100 kesî Avrûpî 80 kesî xwe yî, bi êsle xwe ji gelên li Asya û Rojhilata Navîn neçîrvanî dikirî hatiyê. Profesori vana dikê du beş: Yekê 40 hezar sal berê ji Asya hatiyê Bakûrê Fransa. Beşa din jê 25 hezar sal berê ji Mezopotamya û Kurdistan çuyê Balkanan. Ji sedî bist kes jê 9 hezar sal berê ji rojhilata Navîn hatine(3).

Dîtina dinê ku Kurd ji Rojhilat hatin, ya ji alî kesên mîna Marr, Mînorskî Fîrdusî û gelêkên din ve teyî îdda kirin jî zêde ne mantiqîyê. Di demên paş de hatinêka bi wî rengiyê pêk hatiyê; lê Kurd bi êsle xwe ji wir hatin, ê niqaşên zede dixwazê...Dema Kurd li cihê xwe yî niha bûn, Skandinavya, Bakûrê Çîn û Kafqasya hîn di bin buzê de bû...

Li Misirê, dora çemê Nîl hestiyên mirova yen nêzikî 480 hezar sal berî vê hatinê dîtin(4). Ev ne tişteki anormalê. Mumkunê hîn ji wana kewntir jî warin dîtin. Jiber ku Misir, Anatoli, Kurdistan, Mezopotamya ji bo mirovatîyê





Xarîta ku Prof. Lars Bacman teorîsê kirî

gava şarîstaniyê yekêmine. Li wir, yanî li **"Hîva bereketê"** ê cara sifte mirovan dest bi cîwar bûnê kir, xanî û bajar çêkirin, çandinî kirin, sistama cîvaka çînî li wir pêyda bû, nivîs li wir derket, heyvan li wir kedî bûn, hesin li wir terbiye bû... li Kurdistan û Mezopotamya hêstiyên mirovên kevn nênin dîtî? Bê gûman, lê heta niha lêkolînen ku gor daxwazên mirovatiyê nehatine kirin. Ji ber vê tîrsê ye ku Turkiyê dixwazê welatê me bikê gorîstaneke bin avê...

Li bakurî rojhilatî Musul û Kerkûkê (Barda Balka) di îna (şkefta) da, aletên nêçirwanîyê (avci) 150.000 û 100.000 sal Berî Îsa (BÎ.) hatinî çêkirin hatin dîtî. Bi wan alêtana mirovan xwarina xwe ji fil û xezalan peyda dikirin. Li Başûre Kurdistan di herêma Sanîdar da jî îskelte mirovêkî 60.000 û 40.000 BÎ jiyayî hate tespît kirin. Ev nê wê watê ku li Kurdistanê şarîstaniyê dereng dest pêkir. Baver nakim ku ji ê Misirê kêmtir bê lê hîn derneketiyê holê..

Kesî nizanê Kurd kînge hatin herême. Bi dîtina min evê ji bo mîletên din jî derbas dibê. Lê tiştê teyî zanîn, yek ji xelkên mintiqeyî herî kevn Kurdin. Berî Kurdan tu mîletên dinê li wir jiyayî ye nenê zanîn. Wek mînak; Erebe 4-3 hezar sal BM ji Afrika; Ermenê 700 sal BM ji Balkanan hatinê herême. Berî hatina wan li Kurdistanê heta roja hîro gelêk bajarên herî kevn hatin kişîkirin. Wek mînak: Li Berçemê Silvanê (Çayonu), bajarê ku derketî holê yî 7250-6750 sal BM kevne. Dîsa li Samsatê Nevala Çorî; Gritille û Hayazhûyuk; li kewiya Firat Caferhûyuk; Li Elezîzê Boytepe, Saraybahçe û gelêkên dinê ji vê demê manê. Bajarê Hallan Çemî ku li Zagrosan derketî jî

10200 sal BM ye. Gorî arkeologan di nava wan cîhan de kultûrêka hewbeşê heyê. Mirov dikarê bêje ku Misirî, Kurd û Faris û Çînî xelkên mintiqê ye kewnin.

Cara yekêmin mirovatiyê 8000 sal BM di navbera Filistin, Kurdistan, Mezopotamya (Hîva bi bereket) ye da rişandinê pêk aniyê. Paşê jî ev kara yî bervê başûrê Avrupa belav bûyê.

Li Kurdistanê hatê îspatkirin kû mirovên 12.000 BM derbasî jiyana cîhbûyîne bunê. Yanî, mirovan destî ji nêçirê û koçberiyê kişandiyê û bi cîh bûnê. Lê mumkune ku ev hîn kewntir bê. Bi taybetî ji dora çemên Firat,

Diclê û Behra Kêsk (Hazar). Loma li vê mintiqê bi qasî mirov devarê xwe rind bikin ajal, meyvê, av û xwarinê hebîyê.

Lêkolîne li dora Semsur (Perre-Pirîn) ê hatinî kirin û aletên neçirwanîyên ku di şkeftande hatinî dîtîne îşaret dikinê ku ev aletanê 150-100 hezar sal BM ê çebûnê. Mirovê li vê herême 12 hezar sal BM derbasî jiyana di mala de runîştîne bûnê(17).

Di navbera 6240-5600 sal BZ de jî li Çatal Hoyukê mirovê derbasî jiyana bajara bunê. Tê texmîn kirin ku penc hezar kesê li wir jiyânê. Ga û pezî xwedî dikirinê(1). Wekî birêz Ocalan jî dibêjî: Qebileyên ji pêvajoyê nêçirê derbasî jiyana cotkarîyê û xûdikirina heyvanan bunî nufûsa xwe bi hezaranê, lê tu carî ji pênc hezaran derbas nedibûn. Gund û bajarên ku wan ava kirinî û xaniyên ku wan çêkirinê mîna xaniyê hîro jî li Anatoliya Navîn bi kar tenê. Heta erqên avê çêkiribûn û li gundî Yapali ye jî hîn evê henê(6).

Li gundî Buldix, şopa(iz) pêkên xasê li ser zinaran henê! Evê ji dema volkanik de manê. Mirovêkî pêle heriyê volkanik nayê û bervê rojhilatê direvê. Bi qasî ez dizanim li rojavayê Anatoliyê milyonek sal berê volqan teqiyabûn.. Ev kibûn? Berê wanî bervê rojhilatê, heta ku derê rêviyan? Xorasan, Afganistan, Çîn? Îhtimalekê ku ev Kurdbûn û şarîstaniya wana yekemin di bin volkanan de ma...

Li girê Serabê yî nêzikî Kirmanshan, di kolanan hatî kirin da hatê dîtî kû, mirovên berê di xaniyê me wê re "Tolik" digotî de dijiyanê. Heta derengî li nav Kurdên Anadolîyê da jî hebûn. Wexta ez bi çûk bûm yeka me jî hebû.



Li ser duvarên îne li Anatoliyê resimên pir kewn û basit hebûn; resimên mirovên siftê. Yanî mirov, geyig, kuçik û nêçîrwanî...Di dema neçîrvaniyê da hatibûn çizkirin. Wekî wan resimanê li aliyê Semsurê jî henê. Li cihên dinê Kurdistan jî evê henê. Dema mirov li Riha, Semsur, Malatya û bajarên dinê dora Firat bi cih bunê, yanî 12 hezar sal BM ê, xaniyên hîro ji li Harranê henî û vê re "Konikî teyî gotinê çekirinê...Konik bi xaniyê mê ku vê re tolik digotî va ê pir nêzikî hevîn û ê ji eynî ramanê (fikir) derketinê.

Babilîyan ji bo Kurdan digotin "Mirovên Şikefta"; bi rastî jî cihên ku Kurd lê dijîn di hemiyan de şekeftê henê. Di zimanê Babil de Xorî tê wata şekeft/în-a. Birêz Ocalan li ser rast nivîsandina Hu-Xo-rrîyan, Horrî bi kar tîne(18). Bi dîtina min jî ev rastê, lê dema bi zimanê Kurdî bû rastiya vê texmîn dikim a bibê Xorî.. Ji ber ku Xor di Kurdî de tê mana ro ê; -rî jî te mana rê. Yanî riya ro ê. Ro jî li ba Kurdan pîroz bû...

Pekî cara siftê Kurd kînge hatinê Antoliya Navîn? Ji 12-10 hezar salan berî hîro Anatoliya cihêkî tiji dar-ber, av û bi heyî bû. Te texmîn kirin ku, deşta Cihanbeyli golêka avê bû. Hîro jî hîn îza vê yekê hene. Lê kî dizanê ku niştêcîhên başûr û Navîna Anatoliyê yêkemîn ne Kurdin û îne li vê mintiqê Kurda çenekiribin? Mûmkune ku gelên din jî çekiribin. Em naxazin kesî yan jî kêda wan înkâr bikin. Lê her ku bervê dîroka kevn terî, tarîbûn zêde ye û evên ku her tim înkâr dibin jî emin. Gor baverîyê min, di destpêka mirovatiyê de Kurd ji Çukurovê, Enqerê bigrê heta Xorsan, Kendavê Basra û Filistinê belav dibûn.

Dema mirov balê xwe dide Anatoliyê, Kurdistan, Mezopotamya û Rojavayê Hindistanê di dema kevn da kultureka hevbêşê heyê. Bi taybetî jî di alî olî (dîn) de. Di vê alana fireh de, ji kolanê ku derketî de xuyayê ku; ga, agir, jin, ro, şêr ê wek baverîyên kewn hevbêşin... Kî dizanê ku Frigya yî, Lîdyaya Kurd ji wir dernexistinê? Yan jî nêzîkbûna wan gelên bi Kurdan re çiyê? Gor dîroka Bonniers nivîsî Frigayê ji xelkê Hîndawrupanê(4)...Misiriyan bi xwedê re digotin "**re/Amon-re**" yanî **ro-re** ya Kurda ye. Ez vê îddîa dikim: Kurd di herêmede gelêkî kevnê. Ro jî bavêriya wana yekêmin bû. Misirî jî di bin bandora wana olî, siyasî, leşkerî û ticarî de man û navê xwê de xwe jî ji Kurdan girtin.

Wekî din jî Birch î dibêje; "**Loda-nu, Ruten-**

**nu, Kapodokya** yîyen li Başûr û Bakûrê Torosan bi cih bûnî û Levko-yen ji Suriyê eynî miletin. Di tablêtên Misirî de ev xêlka yî rû sipî/mor, por sor û çav şîn teyê tarîf kirin. Ruten ê li dora Sîncarê dijiyanê." (8). Hîro jî li dor van mintiqana Kurdên bi navî Rutar-Rutikan ê henê. Li Kilikya herêmeda bi navê Kizzuwadna(Adana-Çukurova)hebû û paytexte xwe bajarê Kumme bû. Gelê wir jî ji Hurrî û Luwîyan pêk dihat û bi Hurrî dipeyivîn(9). Abdulhamdi Toplu,vê dipeçirînê lê bahsa Luwîyan nakê. Îhtimaleka pir mezine ku evna dê û bavên eşîretên hîro li Anatoliya Navîn û cihên din dijîn bûn. Li vê mintiqê gelêk devletên-bajarî jê pêk hatinê. Kompozisyona wan bi ê Kurdên li Anatoliyê vê hevdu digre. Yekê jî eşîretê ka bi navê Laden (yek jî Badîn) jê çuyê Cezayîr; navê dişibînê hevdu.

#### Koka Kurdan

Li cografya Kurdistanê hîro da, gelê herî kewnî teyî zanîn **Gutîne** (Kûtî BÎ 4000), wayê ji alî gelek dîrokzan, lêkolîner û arkolagan ve teyê qebûl kirin. Hatîyê ispatkirin kû wa gelayî berê, li Azerbeycan, Wan, Meletî, Samsur û Halebê dijîyê û berî wan jî tu gelên din tunin. Ev mintîqa ku teyî qalkirin, yanî xeta di navbera Turkiyê û Kurdistanê de, îro jî parçên dinê Kurdên li Anatoliya Navînê lê dijîne. Cihên Xorî lê belav bûnê jî ku me da ser, xarîta Kurdên Anatoliya Navîn û birayên wanê derdikevê. Ji Guttîya şunda Xorî (BÎ 4000-1200) ye tene. Li ser vê yekê prof. A. Kaşgarlı î dibêje: "Xelkê li Zaxrosan cara yekêmin bi cih bûyî Lulu û Gutîyên ku li dora Çemê Dîyala bi cih bûnî bav û kalên Kurdanê." Dîsa Prof. Ş. Gunaltay jî dibêje: "Gutîyan devleteka bi navê Gutî, bajarêkî mezîni bi navê Gutium çekirin, li Zaxrosan dijîn û dîroka wan bi qasî nêyî zanîn kewnê". Gelêk dîrokzan, arkeolog û lêkolîner li ser vê lihevdikeyn ku gelê mintiqê yî herî kewn Gutîne berdawamiya wan jî: Xorî, Mîtanî, Kasî, Subarî, Uratu, Med û Kurdin. Xorî Kralê Gutîyanî teyî zanîn jî Emnatumê ku di sala 3100 BM de jiyayê.

Zimanê Gutîyan bi yê Xorîyan va yek bû. Prof. J. Friedrich dibêje, "Morfolojîya zimanê Kurdî bi morfolojîya zimanê Xorîyan va hevdu digrê." (10) Prof. Egon von Eistedt jî dibêje, zimanê Xorîyan mîna ê Gutîyanê.

Piştî Gutîyan edî Xorî ye derdikevin holê. Konfederasyoneka eşîretanê. 4000-3000 sal



BM sînurên Xorriya ji Anadolîya Navîn da heta Azerbeycan, Tebrîz, Hemedan, Musul, Antakya yê firê dibûn. Elên Hurriyan 2000 sal BM li Bakûrê Suriyê, Kizzuwata (Çûqûrova), Amîk û li Anatoliya Navîn belav bûnê(11). **Tê zanîn ku wana Enqerê jê kirinê bin desthilatdariya xwe..** Li wir ez dikarim mintîqa ku Xorri lê jiyani hetani Heratê dirêj bikim. Dema ez çûm rojavayê Heratê, xelkê mintiqê digot: "Li serî wan çiyayên-Hezar Mecît- penc hezar sal berê Kurd dijîni û erdên ku ev lê jiyani nîşan didan. Torî ji dibêje: "Xorri ji çend biran pêk dihatin û welatê wan rojhilat û başurê Behra Kaspî ye bû. Wana bervê bakûrê Mezopotamya belav bûn û 2000 sal BM heta çemê Dîyala dirêj bibûn. 2000 sal BZ va xelka li alî bakure rojava ye Mezopotamya, bakûrê Suriyê jiya" (12). Demêka dirêj ev êşîretana di bin navê Xorriyan de jiyani, lê di salên 2000'î BZ de bûn du bir: Xorri û Mîtani. Li wir bi rihetî ez dikarim ispat bikim ku; ev herêmen ku Xorri lê jiyani hîro jî ji sedî 80 ê di bin kontrola Kurdên li Anatoliyê Navîn û bêşên ku ji wan qetiyani dijîni deyê. Emê li nivîsen pêş vê



*Serê Çiyayên Hezar Mecît (Di navbera Iran, Turkmenistan û Afganistanê) Penc hezar sal berî hîro Kurdê jiyane. Li ser vî çiyayî jî gundiyan got cihên Kurdayê henê.*

yekê hîn ji berfireh binivîsin.

M. Akar jî dibêje, lêkolînen li ser kevir û hestiyên 5-4 hezar sal BM hatinî kirin ispat dikin ku li dora Firat Xorriyê jiyane. Di kolanên li Malatya Aslantepe hatinî kirin de derket holê ku Xorriyên ji miletê Arî 5-4 hezar sal BM di dema kevir de li vê mintiqê jiyane. Di salên 3-2 hezaran de jî derbasê çaxa Maden bûn. Xorriyê sê hezar sal BM li Harranê; 3700-3500 sal BM jî li Dîlok (Antep) ê jiyane(17). Hîro jî li vê mintiqê Kurdê henê û parçêk ji wan jî li Anatoliya Navînê. Akar, bi vê yekê tarîxê hîn kevntir dikê. Ku ev jê mûmkune.

Li kolanên di Alalah hatî kirin da rastî nivîseka li ser kewirêkî hatin, ew belga 1650 sal BM hatibû çekirin û bi zimanê Xorri bû. Di wê belge da bi zimanê Xorri, navên mehan, der heqê gelê hereme da agahdarî û der heqê Xorriyên li Helebê da agahdarîyê hene. Di wê belge da **navê CÛXREŞÎYA YÎ LI XORRIYÊN HELEBE HATIYÊ DANÎN(TORÎ)**. Ev belgê jî bo Kurdên hîro li Antoliyê dijî pir girîngê. Evê tê ve vatê ku Kurdên hîro li Anatoliya Navînê 3652 salan berî vê ê li mintîqa rojhilatê Behra Sipî dijiyanê. Qet nebê beşekî xwe yî li wir jiyayê. Loma, Çuxreşî yê hîro jî henê û ê li nav sînûrên Rusya yan jî di nav sînûrên Sovyeta kewn da nê. Ola wan jî Zerdeştîyê... şîreteka bi navê Ebereshan jê li Kobanê heyê. Bi qasî ez dizanim, **Çuxreşî bi Reşîyan vê jî pismamê hevîn**. Ev tarîxa jî bo me bîngehek pir girîngê...Edî kes nikarê bêje, "emê nizaninî ku em ji kuderê hatinî!" Yekê jî di wirdê karê kî dinî dikevê ser milên lêkolîner û dîrok hezên bi taybetî jî ji Anatoliya Navîn. Ku herin suret, filmê wan keviran bigrin û şaristaniya ku kalên wan vê demê çekirinî bikolin...

Pekî çîrbû ku wan mirovan cihê xwe cihîştin, li herêmeka fireh belev bûn û heta roja hîro jî kesî xebera xwe ji kesî tunê? E. Xemgîn dibêje, Erebo 3000 sal BZ hatin Suriyê û di salên 2800 BZ de jî bi cih bûn û bi Kurdan re şer kirin(13). Di dûra jî devlata Akadê avakirinê. Ji wî şerî şunda Kurdan çiqes çihê xwe guhart emê hîro nizaninî. Gelo Kurd hîn li jêr bûn bervê çiyayê helkiştin? Yan jî bervê bakûr helkiştin û devletên nû avakirin? Bi vê re gîredayî derketina Hîttan (Hattî-yan) ê balkêşê...Yan jî wendabûna Sûmeran ê balkêşê...Hattî berdewamiya Sumeranê? Di nava Hattîyan de xwedê herî mezin Arîna (dayika ro) bû. Xudiyên şaristaniya siftê Sûmer tê gotin ku Kurdin. Hinek dîrokzan dibêjin ji bakûr hatinê, hinek dibêjin



ji başûrê Behra Kesk hatinê. Dema hatinê Başûrê Mezopotamya xwedî şaristaniyêka pêşketî; xwedî pez bûnê û çandiniyê dikirinê. Birêz Ocalan jî dibêje di zimanê Sûmer de, him ji zimanê Xorrit, him jî ji zimanê Amorit (Semit-Ereb) gelêk kelîmê henê. Lê ev ne vê manê ku Sûmer ne gelêkî orîjinalê (18). Wekî me li jor qal kirî, ji Enqerê heta Heratê Kurdê belav bûnê. Evên ji başûrê Behra Kesk hatinî îhtimalêke mezinê ku Kurd yan jî ji familya Kurdan bin.

Gelê dinî mintiqê Ermenî jî, BM di sedsala VIIyan de hatin mintiqê Haldîyan û Haldî ji ber wan helkiştin çiya(14). Tê îddîa kirin ku Ermenê ji Yunanistan hatinê. Bi hatina Ermenan re jî bê gûman Kurd ji cîh û warên xwe bûnê.

Dendikê Asuriyan, gele Sami yî ku ji dora Akad ê hatinî orta Firat in. Ev jê tekabûlû 3000 sal BM dikê (15). Di pirtûka bi navê “12 kavîmen wendayî” de hatiyê nivîsin ku dema Asur hatinê Meopotamya li zozanên jor gelêkî xwedî keriyên pezî hebiyê. Xwîna wî gelî mîna çema dirjînin û welatê wan ji dest digrin. Ev gelê li zozanan û xwedî pez bê guman Kurd bûn.

Di salên BM 857'an de li dora Adiyamanê gelê Arî (Luwîyan?) devleta bi navê Kummuh bi Asuran vê şer dikan. Devleta Kummuh qebûl dikê ku zer, zîv û 300 darî Sedîr bidê devleta Asûr. Hîro şûna van darana tenê ba yî heyê.. (17)

Ji gundê me li wir xwandina bilind dikirin û li ba xwe cîh dane min da kû ez li wê derê bimînim.

Bê rêber, bê piştbaz li vî bajarê xerîb min xwe roj bi roj xerîbtir û jartir didît.

Gelek caran, dema êvaran diketim nav nîvinan, min dest bi girî dikir. Pîr şevan rûyê min li ser balifa ji hestirên min şilbûyî radiketim. Xweş te bîra min kû gelek bîrîya dîya xwe, xwîşk û brayê xwe dikir. Gundê min, hevalên min li dû xwe hiştî, ji bîra min dernediketin. Mîrov dikare bîne zimên kû di vî bajarî kû tê de bi mîljonan mirov dijîn ez bi tenêbûm. Hebûna evqas mirov û mezinahîya bajêr li ber çavên min xuya nedikir. Mêjî, dil û hestên min her gav li ser war û wargeha min bûn. Mîrovên wê deverê ji her alî de ne mîna însanên me bûn. Zimanê wan, cil û bergên wan, rengê pêwendîyên wanên bi hev re heta bêjî henekên wan bi şikleka din bûn. Gelek caran bala min dikêşand; li ezmanê wan tu cara stêrk nebûn, bayê sibê yê hunik ku li gundê me mirov pê ji xew şîyar dibû li vî bajarî nedihat. Çem û çol tunebûn, bîna axe nediket poze însanan.



Kû ger kin were gotin min gelek bîra gunde xwe dikir her gav her şev di dilê xwe de hîs dikir. Durketina ji dost û malbatê dilê min dikewijand.

Ji hêla din ve mirina bavê min kû di jiyana min de mirovekî gelek pewîste, ji min re bibû malkambaxîyêka bêhempa. Lê belê di heman gavê de min baş dizanî kû divê min bixwenda, kar bikira û serfiraz bibama. Ev berpisîyarîyekbû û min baş dizanî herkesê malabatê ji min ev pêşveçûna hêvî dikirin.

Belê, di wan rojên ji bo min gelek reş û tarî de min ev mirova naskir.

Roja yekem min ew dît, li ber dîwarekî, li ser mindereka biçûk rûniştîbû û bi çavên xwe yên qerrimî, bi awirên sar û zîwa li dûr dinêrî.

Min û ev jinepîra hanê hîn hev û dû nasnedikir. Lê her roj dema ez di wê derê re derbasdibûm çavên me bi hev diketin.

Balam, cara yekem dema min ew dît wekî



pêlek agir bi ser dile min de hatibû.

Hîn jî nizanîm ji bo çîye hema gava ewilî min ew dît germahîyekê ez kêşandim ba vê jina pîr. Şara kû wê li dor serê xwe pêçayî mîna şara dîya min bû. Deqên li ser dest û enîyê, xemleka gelek balkêş didayê. Kinc û cilpêça wê, wekî ya hemî jinên gundê me bû. Van taybetîyan, rê li ber min vekir kû ez bi wê re tekilî deynim. Ji hêla din ve, dema min ev jinepîra kurd (min li ba xwe bi bawerîyêka mezin min ew kurd dihesiband) li ber wî dîwarî wûsa bi tenê, xemdar û bi huzn didît, min bi xwe nedikarî. Dixwast xwe bighînim ev jina rû bi xem, pê re biaxifim da kû tenebûna wê parbikim.

Lê ezê heta kengê di ber vê jinepîra belengaz re derbasbûma, min ew ji nedîtî ve bihatama. Her roj piştî kû min dibistan diqand, berê min çex dibû ser wî dîwarî. Gava min ew li wir ditît gelek dilşa û mesûd dibûm. Ronîyek dikete ber çavên min. Beyî kû ez ev jinepîra hanê nasbikim, bi dîtina wê dilgermîyekê ez digirtim. Dibe kû ez hîna biçûkbûm û bîrîya hembêza dîya xwe dikir. Yanî bi zanebûn di profilê wê de min dayka xwe didît. Lê qenc tê dighem kû di qama wê de min perçeyek ji xwe didît. Ev dayîka min bû kû ji min dûr ma bû. Kurdbûna min bû kû li vê derê bi zor û bi rêkûpêk dixwastin ji min bişeqînin. Lê pêwîsttirîn kanîya awênî, hêvî û jiyeneka dewlemendbû.

Tê bîra min. Heyva nîsan a sala 79' an bû. Nayê ji bîrkirin ji bo kû ez di wê demê de hatibûm ev bajarê xopan. Dem bihar bû. Tîna roje her kû diçû germtir dibû bi vî hawî dibû mizgîna bihara rengîn. Piştî xelasîya roja dibistanê ketibûm rê dihatim mal. Dîsa meta delal bi hemî xemla xwe li cihê xwe yê her roj lê dima rûniştîbû. Dema ez hatim û nêzî wê bûm lingên min giranbûn; raweştîyam û beyî kû meta Edûl seh bike min lê dinêrîya.

Du guliyên wê yên ji rengê henne sorbûyî li ser sîngê wê dighêştin hev.

Li ser her du ceynûgan biskan xuya dikir. Ev dimenê hanê dîsa ez dixistim nav xewn û xeyalan. Mîn wûsa bê hemd, cuwanîya metê dianî ber çavan. Carna mîna bûkekê li ser hespê bû, carna bêrîvanbû bejna bilind di-hêjand diçû berîyê. Hîn caran jî keçeka hevdeh salî bû av dianî ji kanîye. Di serê govendan de desmal badikir.



Lê niha sal û demên xapînok ew jî pîr kiribûn; xewn û xeyal ji wê hatibûn dizîn. Bêyî kû ji jîyanê hesab bipirse emrê cîwan derbas bibû. Li ber dîwarekî sar, li welatêkî xerîb mîna kû nedijîya, lê hebûna xwe berdewam-dikir.

Piştî temaşeka dirêj bi xwe de hatim. Pîr caran di pey hev, bê navber dikuxîya. Dema kuxik lê dihat desmala kû di destê xwe de girtî dibire ber devê xwe. Xuya dikir kû ev jî-nepîra hanê nexweşbû.

Wê nedizanî kû ez li wê derê rawestî, li wê dinêrime. Ji bo kû dîsa bi çavên xwe, yên bi awirên dûmanî, bê navber li dûr dinerî. Min yekcar biryara xwe da û ezê biçûma ba vê jî-nepîra hanê kû ewqas zemanê bala min bi germî dikêşîne.

Lê belê di dilê min de tirsek hebû kû min ji xwedê dixwest bi rastnegere. Jînepîra hanê, kû min di xeyalên xwe de cîhê kî ewqas germ û pewîst didayê bigota ew ne kurde, jî-neka turke, min dê çawa bikira. An jî qet nexwesta bi min re biaxife. Li hemberî hemî tiştî min cesereta xwe da ser hev û gavên xwe ber bi wê jîna dil bi xem da avêtin.

Kuxika metê hîn berdewam dikir. Demeka dirêj bi şunde pê hesîya kû ez wanî rawestî li wê dinêrim. Kenekî birîndar dakete ser lê-vên wê, bi awirên xwe ên dûmanî li min temaşe dikir.

Nêrîneka germ, dilşad û dostanîbû. Bi dengêkî nerm gazî li min kir.

Were ba min kurrê min were.

Belê kurdbû meta delal û bi min re bi kur-dî axiff. Ji şabûna min dixwest mîna çûkekê bifirim. Yekcar min xwe gîhand ba wê. Demekê li ser û rûyê min temaşe kir bi wan çavên xwe ye nûranî.

Navê te çîye kurre min?

Ez Memo me metê.

Tu kîye, ji ku derêyî Memo?

Metê ji gundê me re Gundê Omê te gotin. Ez Sêvikî me ji hêla Reşîyan.

Meta Edûl li gor zanabûna xwe herêma ez jê hatîme da nasandin.

Tu ji hêla Haymanê hatîye. Erê gundên wî alî min gelek bîhîstine. Dema ez cîwanbûm me kilamên wê hêlê dizanîn û digotin.

Min xwast meraqa dilê xwe ji dil derxim ka ev jînepîra kîye. Min dest bi pirsên xwe kir.

Metê tu ji kuderêyî. Her roj li ber vî dîwarî

çi dikî?

Ez ji gundê Gollîyê me. Ji min re Edûl' a hecîyê mesto dibên.

Metê Gollî li kuderê ye?

Gundên me li aliyê Çîçekê dikevin. Kurrê min, di malda runîştin ji min re

mîna zindanêye. Li ber vî dîwarî her roj bêhna xwe vedikim.

Min wê demê fehmkir kû meta delal ji kurdên hêla Kırşehîr' e bû. Min dizanî li Kırşehîr' e kurd hene ji ber kû dîyamin a reben jî ji eşîra Têrikan bû û navê gundê wan Tabura bû kû li hêla çîçekdaxî dikeve. Dema min ev yek du re ji meta delal re got gelek kêfa we hat.

Min bi mêjîyê xwe yê zarokî muhasebe dikir lê nedikarî fehm bikim kû şûna vê jînepîra hanê divê ev bajarê bêruh û bêgîyane. Li ba min cîhê meta Edûl divê gundê wê ba. Di serê min de mîna çewtîyekêbû kû ev jîna pîr li vî bajarê xopan mîna masîyê ji ave veqete bi tenê li ber dîwaran rûniştaba, ji hêlekê de li zora min diçû ev rewşa hanê. "di malê de rûniştin mîna zindanêye". Belê ev gotin niha ji gelek caran mîna brûskeke dikeve nav mêjîyê min. Azadîya meta Edûl, dilşadîya wê li gundê wê hebû. Mixabin meta delal ji ber hîn sebebên ew zûdaye li dû xwe hiştîbûn.

Meta Edûl bi dengêkî westî û zîwa ji min pirsî

Memo, ma mala we jî li vê derêye; Li vî bajarê kû ez qet jê hez nakim rûdinin hûn?

Min awirên xwe berdand erdê û demekê bêdeng mam. Bi pirsê meta Edûl re mirina bavê min, dîya min, xwîşk û brayê min, gundê min û hemî hevalên di ber çavên min re derbas bûn. Meta delal fehmkir kû pirsê wê bê bersîv ma û ez ketim nav bêdengîyekê, li min zivirî. Bi her du destên xwe yên tenê hestî û çerm mayî rûyê min xiste nav her du lepên xwe. Dû re destên xwe li ser serê min, di nav porê min de gerandin.

Meta Edûl careka din zivirî min û pirsî

Memo lawo ma tu ji mîna min li vî welatî xerîbî?

Serê min di ber min de min li erdê mêze dikir. Hedî hedî serê xwe rakir û bersîv dayê.

Belê metê ez jî mîna te bêkes û xerîbim. Vaye bûn çend hefte ez hatime. Li ba çend xortên ji gundê me dimînim.



Ma dê û bavê te hîna li gundin?

Dîya min digel çend xwîşk û brayê min li gundin. Bavê min bû çend heyv mirîye.

Meta Edûl kesereka kûr kişand û dîsa çavên wê zivîrîn nuqteyeka dûr û bêdend ma. Piştî demekê deng pêket û bêyî kû awirên xwe ji wê nuqteya dûr rake û got:

Memo lawo, ez jana mirinê û birîna kû mirin vedike baş dizanim.

Derbeyên felekê li ser min gelekin. Lê bawer bike jana xerîbîyê ji wê derbê jî girantire. Vaye dil û cergên min hêlîyane; kuxik û nexweşî rê nadin kû ez bi yekî re deng bikim. Lê derdê giran bê war mayîne.

- Metê min nedixwast kulên dilê te vebikim. Jîyane ma em çi bikin?

Meta Edûl mîna kû bixwaze naveroka sohbetê biguherîne, her du destên min xistin nav destên xwe û got :

Ev jinepîra hanê birînên xerîbîyê di dilê wê de vekirî gelek eşkere dianîn zimên. Di her kesera wê de di her gotineka de hesret û huzn veşartî bû.

Kurre min, xwîna min kelîya ser te, kû tu bixwazî her roj were ba min ez tim li vê derê me.

Dema min a çûyînê jî hatibû. Min destê meta Edûl maç kir, soza careka din hevditî-nê dayê û ketim rîya xwe ber bi mal de çûm.

Min di rê de gelek caran nehlet li xerîbîyê û perçebûnê anî. Ji min bihata min dê meta Edûl ji van deran bibira. Bibira ba dîya xwe bila li gundê me di nav kurdan de heya roja mirinê mesûd bijîya.

Ji wê rojê bi şunde piştî bi dawîbûna dersên min ên rojane her dem dihatim ba meta delal. Bi dengê xwe yê germ û şêrîn, bi axaftina xwe ya kû dupî û bahozên di dilê min de kom bûyî bi dawî dikirin, ji min re bibû kanîya sebr û aramê.

Her kû dem diçû mîna du hevalên ji dil û can em nêzî hev dibûn. Têkîlîya bi meta şêrîn re gelek sebra min dianî. Rojekê dîsa ez li ba rûniştîbûm, metê berê xwe da min û got:

Memo, ji bo kû tu xwendinê dikî qey tu bi zimanê van jî dizanî ma ne raste?

Erê metê ez hinek turkî dizanim.

Dema digote "zimanê vana" bi detsên xwe xelkê li kolanan şanî dida.

Li gor xwe, sînor dixiste navbera xwe û "wana". Li ber çavên wê herkesê di wan de-

veran re derbas dibû, herkesê li vî bajarî dijî turkbûn û bi hawî jî bîyanîbûn,

nenas bûn. Ji meta Edûl re hebûn û nebûna wan ferq nedikir ji bo kû di nav ewqas mirov de ew dîsajî bi tenê bû. Di nav xewn û xeyalên xwe de dijîya û emrê kal derbas dikir. Dîsa kuxikê pê girt lê wê axaftina xwe her berdewam kir.

Kurre min vaye bûn deh û du sal em hatine vî bajarî. Tu ji min bipirsî

tu caran bi hatina vê derê ez nerazîme. Lê ji destên min çi tê. Lawê min got divê em barkin ji gund, herin bajêr da kû li wir bazirganîyê bike. Ji bo bûka min û nêvîyan wekî şahîyê bû. Lê li ba min mirin bû. Bawer bike di serê xwe de her roj gundê xwe xeyal dikim. Demên berê xeyal dikim. Demên berê lawo dema kû ez Edûl bûm. Erê ez Edûl' a hecîyê mesto bûm. Bi cîwanî bî mam. Zarok mezin kirin bê mêr. Mal îdare kir min, kerîyê pêz li ber derî tevna li dar xanî û bêrî û mexel hemî bûne derew. Niha li vê derê mîna şekala ber malê bê qîmet û bê rummet jîyanê berdewam dikim.

Dîsa kete nav bêdengîyekê. Ewrekî reş da-kete ser rûye wê yê nûranî. Di çavan de huzn û xemgîniyê xwe dida xuyakirin. Ez jî di gel we bêdengbûm. Wekî tiştê ketibe gewrîya min, min bi xwesta jî deng bi min nediket. Kuxika malik xerab ev jinepîra diljikestî tev de dihêjand.

Memo, meta te berê li gundê xwe bû. Bêrîvan bû, kewaniya malê bû,

Dayîk bû, jin bû, cîran bû, heval bû yanî ez Edûl' a Hecîyê Mesto bûm. Lê binêre niha bûme kanîyeka bê av. Her roj li ber vî dîwarî wûsa xerîb rûdinim, bêyî kû kes min nas bike û silavek bide min.

Ma tu dizanî di mala xwe de ez wekî siya dareka bê pelim. Ji neviyên min kes bi kurdî napeyîve. Fehm bike lawo, zimanekî kû ez bi zarokên kurre xwe re bipeyîvim nemaye. Naxwazin li ba min rûnin. Ez baş dizanim ji min fedî dikin.

Cil û xemla min ya gunde; em kurmancin me wûsa dîtîye ji mezinan. Lê niha em hatine nav turkan dixwazin mîna wan bibin. Lê bizane tu car cil û cilpêça xwe naguherim. Mirin jî hebe şara serê xwe navejim. Qîmeta dê û bavên xwe bizane. Ji kok û axa xwe bi dûr nemîne. Em kurmancin edetên me ne



mîna yên turkane.

Ku em niha li xwe xwedî dernekevin di pêşerojê de emê dereng bimînin. Heyfe kû em li van dîyarên xerîb bihêlin wenda bibin.

Dema ev gotinên dawî dikirin kuxikê lê girt û gaveka dirêj berdewamkir. Dema min dît kû dawî li kuxika wê nehat wûsa tirsek hate min. Ez rabûm ser xwe, da kû alîkarîya wê bikim. Bi destên xwe îşaret kir, kû ez ne-tirsim ji bo kû ev halê wê yê her roj bû.

Çûyîna mina ba meta Edûl ya rojane edî ji min re bibû karekî rutîn. Her cara kû ez di-çûm ba, ji min re wekî şahî bû. Ji bo kû meta Edûl bi sohbetên xwe yên şêrîn ez dibirim cîhana xewn û xeyalan. Baş tê bîra min dema metê ji min re qala serpêhatîyên xwe dikir paşê, êvaran dema ez diketim nav nîvînan, ev serpêhatî hemî wekî filmekî di ber çavên xwe re derbasdikirin û her carêjî meta Edûl dibû qehremana bingeîn di nav wan filman de. Hîn caran dibû bûkeka li

ser hespê spî. Carna govendkêşeka ji xwe bawer kû çavê xortan li dû. Car hebûn dunya bi ser wê de hildiweşîya, hestir dibarandin li ser gora brayê xwe, kû bi cîwanî hatibû kuştin.

Meta Edûl bê guman di wê demê de ji min re bibû dergehê sebr û aramê.

Bê şik ez di wî zemanî de biçûk bûm, lê ev jînepîra hanê cîhana min ya xeyalan gelek dewlemend fikir bi wî zimanê xwe yê şêrîn. Gelek çîrok, gotûbêj û hikayetên di nav kurdên Anadol'a Navîn de bi nav û dengî min ji meta Edûl bihistin. Niha baş tédîghem kû li gorî wê demê li ba min çavkanîya çanda devkî

Ya kurden herême bû. Lê kesî ev nedizani qîmet nedidayê.

Rojekê dîsa ji belavbûna me ya ji dibistanê bi şunde vegeyîyam ba meta xwe. Min silav lê da, destê wê maç kir. Li kêlekê runiştim, li hal û xatirê wê pirsîm. Min ji çentê xwe çend nanê sêlê û tozek penêr derxist û da meta Edûl. Dîya min roja berê ji min re şandî bû. Meta Edûl gote min:

Ev çîye kurre min?

Nane metê, nan û penêrê gunde, dîya min ji min re şandîye û min ji te re hinek jê anîye.

Demekê rawestî; bi ser nanê min jê re anî de mêze dikir.

Memo, diranê min nînin. Yên min daxme ne ev jî ne bi min re ne, li malin.

Lê ev nana gelek caran bîhn kir. Du re, çend caran li ser hev Got:

Xwedêyo tu canê min bistînî.

Çima ev gotina kir hîn jî nizamim. Lê wer xuya dikir kû êdî ji canê xwe aciz bibû. Di wê gavê de keçeka di emrê min de şerbikek tijî av di dets wê de hate ba me. Ji meta Edûl re kaseyek av tije kir. Metê ava xwe vexwar û ji keçikê re bi kurmançî got:

Nazan ev xorta Memo ye, ji gundê aliyê re-şîyan.

Keçike wekî qotina meta Edûl qet nebihîstibe helwest girt. Metê vê carê ji keçikê re axaftina xwe weha berdewam kir:

Binêre ev nanê sêlêye. Memo ji min re anîye kû hez biki tu jî were bixwe.

Na ez naxwazim

Keça pozbilind tenê ev bersîva da. Zimanê wê bi kar dianî turkî bû. Meta Edûl ber bi min de zivirî û ji min re ev pîrsa sererast kir.

Ev keça kurrê mine. Carna wûsa bi ser min da te. Ma keç û xortên vî zemanî nanê sêlê ji kû dizanin.

Min wer fehm kirîbû kû Malbata metê xwe ji zû de bi destên xwe ji nasnameya xwe ya kurd bi dîrxistîbûn. Ji helwesta nêvîya meta Edûl xuyadibû kû keçikê nedixwast li ba wê were dîtin. Ger vekirî were gotin wê pîra xwe fedî dikir. Nedixwest kesên wê li ba pîra wê bibînin. Bi dîya bavê xwe re kû her du jî di maleke de dijîn bi turkî diaxivî lê baş dizanî kû dayika pîr bi turkî nedizani. Wekî heqere-tekê bû ev yek. Min baş fehm kir çima Meta Edûl hewqas bi kul û kesere çima hewqas xwe bê qîmet didît. Gotina wê kû digot ji kokê xe bi dîr nekevin wê gavê di serê min de manêyeka giran stand û hîn jî mîna şîreteka giranbiha hîn jî di bîra xwe dihênim.

Têkîliya min û meta delal her wûsa berdewam kir. Lê nexweşîya wê jî her kû diçû li ser wê giran diket. Roj bi roj jartir û nexwaştir dibû. Dengê wê, te digot ji binê bîrê derdiket.

Rojekê dîsa ez li ba rûniştîbûm dest bi gotine kir.

Memo kû ez bimirim dixwazim ji te re tiş-teki bihêlim. Tu dê çi bixwazî.

Xwedê neke metê ev çi gotine?



Kurre min tu jî dizanî kû mirin ji pîran ne dûre. Bêje ji min re çi dixwazî?

Metê şara serê te bidin min bedêla dunyê ye.

Ez qurbana te bim.

Havîn hatibû êdî. Dunya germ bibû. Bi hatina havînê re min zêdetir bîra gundê xwe dikir. Kû zor û zehmet jî, bû dema bidawîbûna dibistanê hat.

Min hazirîya xwe kir û dibistanê derketim çûm ba meta xwe, me sohbet kir û min xatirê xwe jê xwest. Dema min destê wê maç kir gaveka drêj li min mêzekir û destê min berda.

Rîya te vekirî be lawo.

Belê ev gotin îroj jî di guhên min de deng lê didin. Ji bîra min naçin.

Ez çûm gundê xwe. Mîna kevokeka azad bûm êdî. Min axa gund dikire nav lepên xwe bêhn dikir. Mîna rêwiyên kû li germa havîne bi hesreta avê bimînîn wûsa hesretdare warê xwe bûm.

Lê şev û roj di pey hev derbas dibûn. Dawîya demên xweş zû te. Dîsa tirs û lerza çûyîna vî bajarê xopan ez girtibûm. Roja çûyîne hat û ez derketim rê. Dayîka reben di pey min dest berda girî û hesrên çavan dibarandin.

Ji ber xemgînîya dilê xwe nizanî çawa gihêştim Enqerê. Çûm ba hevalên xwe, hazirîya xwe kir da kû sibe dest bi dibistanê bikim. Ji hêla din ve gelek meraq dikir da kû meta Edûl çawaye.

Roja ewîli ya dibistanê gelek li zora min diçû. Xwendewanan ji hev re qala kiryarîyên xwe yên havîne dikirin. Min guh didayê carnan û fehm dikir kû jîyana wan û ya min bi tu havî ne mîna hev bû.

Piştî ji dibistanê derketinê şunde bi lez ketim kolana kû mala meta Edûl te de.

Berê xwe da wî dîwarî da kû meta delal bibînim. Lê ne li wê derê bû. Gavekê di cihê de rawestîyam. Nehat û ne li cihê xwe bû. Tirsê kete dilê min. Ma gelo meta meta şîrîn mirîbû. Na dibe kû nexweşbû li mal bû. An jî kurrê meta Edûl ew birîbû gundê wan. Ji bo kû wê gelek bîra gundê xwe dikir.

Demeka drêj li cihê xwe mam. Lê ne kes hat ne jî kes çû. Bê çare çûm ber bi malê de. Hevalên ez li ba dimam dîtin ez gelekî xem-

gînim pirsîn ka çi heye.

Min ji wan re naveroka meselê negot. Dersa xwe qedand û raketim.

Roja li dû, dîsa hatim wê derê lê ew ne li cihê bû. Meta min vê carê ne li ser soza xwe bû û min êdî nedikarî xwe bixapînim.

Çend roj wûsa bi meraq derbasbûn lê pejna wê xuya nedikir. Rojekê dîsa hatim cihê xwe bi hêvîya dîtina meta xwe. Ev tune bû. Li wî cihê kû berê ez li ba meta Edûl rûdiniştim rawestîyam. Piştî demekê min dît kû nêvîya meta Edûl kû navê wê Nazan bû ber bi min de dihat. Bi turkî ji min re got:

Merheba

Di destê wê de kîsek hebû û da min.

Ev yê te ye. Bi xatirê te.

Nazan çû û hema min bi lez li hundirê wî kîsî nihêrî. Di kîs de şareka reş hebû.

Ev şar ya meta min, ya meta Edûl bû. Meta şêrîn xebera mirina xwe bi şandina şara xwe da bû min. Di cihê xwe de runiştim. Hêstir dibarandin bi ser Şara meta Edûl de kû min di nav her du destên xwe de girtîye. Ev xebera reş bi şara xwe ya reş da bû min.

Naskirina min û meta delal pêvejoyeka çend mehan bû. Lê li ser min tesîreka gelek mezin kir. Ne mîna gelek jinên ku li gundên me dijîyan bû. Gelek dîtibû

û derbas kirîbû. Mîna kesê xwedî cemaat kû li dinê hemî geryabe xwedî ziman û çandbû. Mirov dikarî bi seetan bê westan guhdarîya wê bikira.

Meta Edûl, meta delal bê guman ruhekî kurdewarîyê da min. Her roj dema ez diketim nav nîvanan gotinên vê jînepîra hêja di serê min de raman û xeyalên min dixemilandin. Kurdîya wê gelekî paqij bû.

Teknîka axaftina wê gelek şêrîn bû. Min hez dikir guhdarî bikim. Ji tarîxê de gelek behs dikir. Bûyerên kevn baş dizanîn. Eşîrên heremê yek û yek dijmartin. Stran û kilam gelek caran ji min re, ne bi zirava lê bi gotin digotin.

Niha baş têdighem kû di wî warî de jî xwedî zanebûneka çandî bû. Dema li ba metê rudiniştim sebr dihate min. Bi axaftin û awênîyên xwe dilê min ronî dikir. Lê di vî dilê de şûneka zêrîn girt.

Gora te bihişt be meta min.



# Kişilik, insanın kendisine karşı olan güveni ile oluşur

## Memo Zana

İnsanda kişiliğin gelişmesi, güzelleşmesi veya çirkinleşmesi kendisine olan güvenle oluşur. TC nin 81 yıllık Kürt politikası bunu bizim elimizden aldı. Bunu alırken tüm yolları da denedi ve bütün araçlarını harekete geçirdi. Yani: ilmi, sosyal, psikolojik, ekonomik, dini, kültürel ve diğerleri.

Başta üniversiteleri olmak üzere, sisteme bağlı diğer eğitim kurumları Kürt kişiliğinin yok edilmesi veya düşürülmesi için elinden geleni yaptı. İlk öğretim kurumlarında; tek tip elbiseden başlayarak, çocuklara anadillerinin yasaklanması ve şiddetle Türkçe öğrenmeye zorlanmaları ile ırkçı marş ve tarihin öğretilmesinden; üniversitelerdeki merkezi ve özgür düşünceye sınırlamalar getiren sistemle Kürt kişiliği yok edilmeye çalışıldı. Bunlara paralel olarak, Kürt kültürü çalınarak, tercüme edilerek ve Kürt kültürünün olmadığını, olanın da ilkel ve çok geri olduğu ileri sürülerek Kürt çocuklarının kendi kültürlerine yabancılaşması, hatta düşman kesilmesini sağladı. Yukarıda saydığımız alanlar da çok çeşitli bir kuşatma ve saldırı ile beyinlere Kürtlükle ilgili olan herşeyden kaçmaları için devamlı ırkçı aşılarda yapıldı. Kürtler bu kapandan kurtulamadı ve teslim olmakla yüz yüze kaldı. Bununla gelen güvensizlik de Kürtler üzerine çığ gibi çöktü.

Bütün bu kuşatmaların sonucunda Kürtler; kör, sağır, topal ve kısacası handicap bir hale geldi. Kendi değerlerini yemeğe başladı. Irkına, kimliğine, tarihine, diline ve kendine düşman olarak, kendi inkarına gitti.

Yüzyıllar sonra bir güneş doğdu medeniyetin ilk filizlendiği kutsal topraklarda; medeniyetin anasından. Binlerce yıl birikmiş olan buzulları eritti. Tıpkı 15 bin yıl önce medeniyetin gelişmesinde olduğu gibi. Bu seferde: Medeniyetlere atalık etmiş olan Kürtler tekrar canlanmaya, kendilerini aramaya ve kaybettiklerini aramaya başladılar.

Bunun için de O koca bir yaşamı feda etti; hiç bir şahsi ve ailevi bir çıkar gözetilmeden

gece gündüz çalıştı. Büyük emekler ve mücadeleler verdiğine ucu ile kuyular kazdı. En büyük mücadelede, verilen tahribatı düzeltmek için, kendi insanına ve öğrencilerine karşı verildi. Yoktan var etti. Ve derken kahramanlar tarihe şanlı imzalarını attı.

Evet yok olmaktan kurtuldu koca bir halk, kültür, dil ve dünyanın en eski medeniyet yaratıcıları... Tarihin halklar mezarlığından son anda kurtarılmıştı, tarihe ilk nefes verenler. İbrahim de son anda kurtarmıştı; halkının başına geçerek zoru yenmişti. Dört bin yıldır tarih İbrahim'in çıkışını anlatır; O'nun da anlatılması elbette ondan az olmayacak...

Bugün bir Kürt, göğsünü kabarta kabarta kimliğini söylüyor. Halbuki 20 yıl önce kendimizden utanırdık. Şehirde okuyan arkadaşlarımızın; babalarının kötü Türkçe konuşmasından, fiziki yapısının Kürtlere benzemesinden nasıl utandıkları ve mahallede oturanların bunu fark etmemesi için nasıl babalarından on metre önde gittiklerinin hikayeleri hala kulaklarımızda. Bu yaşanmış olaylar hala Orta Anadolu Kürtleri arasında anlatılır. Güneşimiz sayesinde biz kendimize geldik ve bize bir hayali gerçekleştirdi. O'na minnetarız. Böylece körler gördü, sağırılar işitti, topallar yürüdü.

Artık ayağa kalkmış bir halk olarak tarihimizi kendimiz yazmaya kararlı ve bilinçliyiz. Yolumuzu kendimiz çizeceğiz. Başkasının bize çizdiği ve bizim sonumuz olan yollara artık kanmayacağız ve kendimize güveniyoruz. Bu dergi de onun bir ürünü. İleride de Kürtçe okullarımız ve başka kurumlarımız olacak.

Yaşadığımız dünyada insanlar, bir hayvanın veya bir bitkinin ırkını yok olmaktan kurtarmak için çaba içinde. Bizim de kendimizin yok oluşuna seyirci kalmamız bir tarihi ayıbımız idi. Bu ayıptan kurtulmanın yolu; bundan sonra Türk ve Kürtlerin eşit temelde ve demokrasi içinde yaşaması ve mutluluğu için çalışmak ve bunu yapmaya çalışanlara destek vermektir.



# Were Hevalo

## Dîlşad Nûdem

Hevalê xewnên şevên reş û tarî  
 Çend şev derbasbûn di ser çûyîna te de  
 çevîn bi sar û bê berbang  
 Çend dem û demsal borîn bê te  
 Lê tu nehatî

Ji çûyîna te bi şunde  
 Ken revîya ji ser lêvên zarokan  
 Lorîn û hesrên çavan hev dixemlînin  
 Hêvî cemidîn hêvî di çavên dayîkan de  
 Gul vnebûn tu car  
 Bulbul ji evîna xwe bêzare  
 Heyv û stêrk xeyîdîne li esmanan  
 Xêlîyên bûkan dernakevin ji sanduqan  
 Bi kefenê canên cîwan re bûne cîran

Hevalo, hevparê xem û derdên min  
 Êdî çîrok nayên gotin li dor tenûran  
 zarok stûxwar man di şevên zivistanan de  
 Tevî li darnakevin neqş bi neqş  
 Destên bi henne nagerin li ser hevdan

Dengê stranên paleyan xatir xwest ji zûda  
 Bender bê xwedîne  
 Çemê gundê me av naherikîne  
 xwîn digirî li şûna avê  
 Ji bilûra şivanan awazên kezebsoj belav dibin

Hevalo can bi gorî

Dil westîya ji çûyîna te bi şunde  
 Te dixwaze her gav  
 Guh nade şîretan  
 Kû ji çûyîna te bi şunde jîyan teva bibejî

Çavên te radimisim bi hêvîya hev ditîne.



# Zayend

Ahmet Duydu

Armanc rast axaftin û rast nivîsandin e. Zelalî û delaliya zimanekî bi vê armancê pêktê. Gelê Kurd; rêxistin û nivîskarên vi gelî, di kîjan merheleya vê armancê de ne? Pirs ev e. Bê guman gihê tina vê armancê, ne hêsan e. Çunkî ziman Jiyana e; çawa ku jiyaneke mûtlaq nîne, ziman jî ne mûtlaq e û ne békêmasi ye. Lê ziman bi jiyaneke pê ketî ve ba û xwe dibe, zengîn dibe. Jiyana pê ketî; dewlet tê de, xwedî her celeb rêxistin bûn e. Di pê ketina zimanî de dewlet xwedî erkeke mezin e. Ji ber ku di dewletê de ax, ni timan, bazar û perwerdahî; bi kurtî jiyana bi rêxistinî heye. Ji xwe dewlet hebûya belkî hewcedariya vê nivîsarê jî nedibû. Hînga çi divê? Divê rêxistin û kesên vî zimanî (devkî/nivîskî) bi kar tînin, hewl û zorê bidin xwe ku rast biaxivin û binivîsin.

Çend sal in ku ez li ser pirtukekê dixebitim; mijar di zimanê kurdî de Zayend e. Xebateke zanistî û dirêj e. Armanc ji bo pirtukxaneyê kurdî pêkanîna çavkaniyeke xurt e. Bingehîn mijar Zayend e. Li dor aliyên vê mijarê û bi vê ve girêdayî hinek babetên din jî derdikevin. Me dil heye, ku em ji encama lêgerînê a li ser Zayendê be eke kin bidin, ka di baxçeyên Kurdî de çi heye, çi tune ye, nivîskarên Kurd û Zayend li hev tînin an nayên? Ğ bi vê re jî gavek bê avêtin; gaveke ku bi xwe re Zayendê bîne rojevê, li ser bê nivîsandin û axaftin. Berî vê, bi kurtî be jî, em binêrin ka Zayend çi ye, çawa çêbûye, taybetiyên ku nêritî û mêhêtîyê pêktînin çi ne? Di lîteratûra Ewropa û zaraveyê Kurmancî de ci-hêtîyên Mêhêtî û Nêritîyê çi ne?

## Zayend çi ye?

Li ser zayendê, berê jî, bê guman xebat hatine çêkirin. Lê bi zanistî û pisporî, cara yekem Herder û Adelung dest bi vî karî kirine. J. G. Herder di pirtuka xwe a bi navê "On the Origin of Language. 1772" de weha dibêje: Mirovê kevn, sewa ku manekê bide hebûna

xwe, ji bo ti tînen zindî bêjeyên wek mirov, lawir, gîha; ti t û elementên nezindî bêjeyên wek erd, kevr û av; hêzen xwezayî, super xwezayî bêjeyên wek jinxwedê, mêrxwedê an jî, mêt û jin, ba î û neba î hemû bi kesatî kirine. Di vî zimanî kevnar de, her sê zayend jî, hatine pejirandin û bikaranîn. Di dem û mercên xwe de bêje wek Nêr(masc.), Mê(fem.) û Bêzayend(ntr.) ji hev veqetîyane û ketine jîyanê. Va jî bi xwe re kategorîzekirina zayendê tîne rojevê. Bi vê re jî ferqên di navbera Nêritî û Mêhêtîyê de û drow (ekl)ên ku ji aliyê seksê ve di ibin hev zelal dibin. Mirovê wê demê va mevhûma (Zayend) ji jîyana xwe biderxist. Ti tînen ku her roj didîtin ev bûn û ev jî, jîyan bi xwe bû. Wek van ti tan jî hev veqetîne, ramana di mêjuyê xwe de, derbasî jîyanê kir, ango pê axivî. Pa ê di zimanî de bingeh girt û jê ûnda jî kete rêzimanî.

## Zayend çawa çêbûye:

R. Johnson(1706): Bêjeya zayend, digihêje peyva Latîni Genus`ê. Ev jî tê maneya zayîn û ber(species-tür)`ê. Ğ ji bêja Latîni "gigno"(sebeb bûyîn)`yê tê.

K. R. Lepsius(1880): Navên mêhê, ji orjînalên navên nêr, wek zêder çêbûne, çawa ku hewa(Eve) ji parsu(rib)`ya Adem çêbûye. Mêran hem ziman çêkirine û hem jî mêhêtî dane zimanî û xwedî çê id û çê nî kirine.

A. Meillet(...): Berê zindî ji nezindîyan veqetîyan, pa ê jî parvebûna navên zindî pêkhat. Di vê pêkhatinê de mê(fem.) di nêr(masc.)`ê gerîya, ango jê za û veqetîya.

J. Grimm(...): Di wê dema kevn de rastî ti(t-obje) ji heyalê azad bûye, di mêjuyê mirovî de zelal bûye û mirovan elementên li derî cîhana xwe, xwedî taybetiyên nêr/mê hesibandine û bi kesatî kirine.

J.T. Bakker(1899): Di Rêzimanî de jî, jin û mêt hevudu hembêz dikin. Bi gotina Hele-nîyên kevn; ziman teqlîta jîyanê ye.



J. Lohmann(1932): Gelo dibe ku pê deçû-  
na mê(fem.)yê bi nebûna bêzayend(ntr.)ê  
ve girêdabe? Dibe ku bibe. Eger pir dereng,  
bi nîzamekî nu, sîstema Zayendê, bi maneya  
du cînsiyeta ava bûye, hîngê bêza-  
yend(ntr.)a kevnar, a ku hatî sadekirin, bin  
pê bûye û li vê rêyê çûye. Li gel vê, du hezar  
salî berî zayîna Îsa Bêzayend (ntr.)a di Hîtîti  
de bi formeke cihê, bi bingehekî xurt û bê  
qûsûr dihat bi karanîn û Fem. jî di vî zimanê  
de tunebû.

Di Lîteratûra Ewrûpa de taybetîyên Mê-  
hêtî û Nêritîyê:

(J. Grimm û Adelung)

NÊR (masc.)	MÊ (fem.)
Çalak - aktive (eng- liveliness)	Neçalak - passive
Gir - larg	Xemgîn - susceptible
Sert - frightful	Biçûk - small
Hêzdar - strong	Nerm - soft
Tund- size	Lawaz- felt
Bi tirs - terrible	Zarîf - delicate
Bêber - infertile	Narîn - attractive
Çirkîn - ugly	Biber - fertile
Bideng - voiced	Rind - beautiful
	Bêdeng - still

Bi tesbîtên min di zaraveyê Kurmancî de  
taybetîyên Nêritî û Mêhêtîyê:

N R(masc.)	M (fem.)
1- Pij: Zimanê marî Hestîyê pi tê Strîyê darê	Qul: Gewriya marî(mêr) Mofika pi tê Bêjînga malê
2- Girik: Girê re Hewrazê spî Tûmê re	Kort: Bîra avê Newala sor Koda spî
3- Nezan: Zinarê re Çiyayê bilind Stuyê wê	Pan: Lata gorê De ta Heranê Enîya wî
4- Xurt: Bazê gewr Xaniyê mezin	Lawaz: Çivîka re Hêlûna hehecikê
5- Nebedew::Çiyayê kepirê Pelê darê	Bedew: Gula sor Berfina narîn
6- Tund: Teyrê re	Zarîf: alûra xwe deng
7- Hi k: Darê hi k	Nerm : Dara ter
8- Bêber: Go tê mirî kê (jê nazê) Genimê cêcê	Biber: Hêka mirî kê (jê dizê) Cêca genimî (gênim)
9- Aktiv: Çemê Zapê	Paşiv: Gola Wanê

Bi hêviya ku va gava bibe destpêka guftu-  
goyeke xurt û berhendam, em bê îrowe ji hin  
nivîskaran encama lêgerînê didin.

NIVÎSKAR / ÇAVKANÎ	RÛPEL
C.A. Bedirdxan / Li mala C.A.Bedirxan /E.C.1998	
-- Berêkî din heye...	118

-- Peyayên vê berê...	118
Qanatê Kurdo / Gramera Zimanê Kurdî 1990	
-- ... wî sewtî bi raberî sewta p...	22
Şerefînaz / Çiyayê Agirî 1990	
-- Û her dem bî tirsekê dihatin bi tirsekî diçûn.	11
Torî / îlan 1990	
-- ... di wî r di wî raw î de...	18
-- Raw a wê rojê...	31
F Hüseyin Sagniç / Hêmana Rêzimanê Kurdî 1991	
-- Hêmana RÊZIMANÊ KURDÎ (Sernivîs)	
-- Zmanê Kurdî bi hêmanê xwe...	15
Redwanê Alî / Tilûrê Bêgane 1991	
-- ... ji erdekê biguhêzî erdekî din.	10
Mehmed Uzun / Evdalê Zeynikê 1992	
-- ... wî qulingekî li kêleka sazê dît.	58
-- Digel ku qulingê jî Temo dît... "	
Yasar Kaya / Gotin 1996 (Welat 1992)	
-- ... min wî çaxî dest pê kir...	9
-- Em ê wê çaxê karibin...	62
Mahmûd Baksî / Gundikê Dono 1992	
-- Cerê xwe danî erdê...	9
-- Cera xwe da ser milê xwe...	11
Fîrat Cewerî / Mî(k û Mirov 1993	
-- ... çûkekî (îrîn ...	6
-- ... çûkeke biçûk ...	119
Bavê Nazê / Govenda li ber mirinê 1996	
-- ... temena keça wê	8
-- ... temenê xwe...	56
F Melik Aykoç / Kurdîzan 1996	
-- Di vî zaravê me de...	105
-- ... vê zarava me de...	105
Selim Biçûk / Rêzimanê Kurdî 1997	
-- Lêkera alîkar...	193
-- ...pê(îya lêker digire...	193
Samî Berbang / Welat 133. 1998	
-- ... lêkerê wî karî lêkerêkî tebatî ye.	5
--Lêkerên tebatî bi alîkariya lêkera...	5
M. Mihemed / Ek-Politika 28.12.1998	
-- ... poreka spî...	12
-- ... porekî wekî...	12
Haluk Öztürk / Roja Nû 53. 1998	
-- ... û herdu wê evê di xanekî da man.	15
-- ... li vir xwediyê xanê...	15
Helîm Yusiv / Ekpolitika 13.03.1999	
-- ... ji ber zincîrê destê...	14
-- ... dîsa zencîra destan...	14
Serdar Ro an / Nûdem h. 29 1999	
-- ... bîranînên jiyane xwe...	13
-- ... çarçoweya jiyana wê...	15



# Sewda ya ber dilê min

Xizan Şîlan

Sewda ya ber dilê min  
 Bermalya mala min  
 Êdî xewa min nayê bê te  
 Êdî sebra min nayê bê te  
 Bêhna min li min teng dibû  
 Sibe ya min li min dereng dibû  
 Min berê xwe dabû te  
 Li te digeriyam  
 Di xewnên şevan de  
 Li te dinêriyam  
 Carnan diketim nav ramanên kûr  
 Difikirîm, diponîjim ji dûr  
 Çavên xwe li te digerînim ku  
 Te bibînim  
 Wekî ku raste te hatibûm  
 Min tu dîtîbûli hember xwe  
 Hestî yên parsî yên min  
 Hêliyabûn li ber te  
 Xwîna min kelîyabû ser te  
 Ew xwîna ku canê min  
 Li min peritandî  
 Ew eşq û evîna dilê min ku  
 Kezeb li min dişewitandî

Sewda ya ber dilê min  
 Şewqa awirên çavên te  
 Dibirîqîn, diçirîsîn  
 Di çavên min yên xemgîn de  
 Te ez mirovekî bi hest kiribûm  
 Te ez sewdaliyekî bîndest kiribûm  
 Te ez sergêj û sermest kiribûm  
 Ez bûbûm esîrê sewda ya te  
 Qet azad û serbest nedibûm  
 Sewda ya ber dilê min

Li te digeriyam aware aware  
 Dengê min bi qêrîn û haware  
 Eşk û evîna min ji te re diyare  
 Xemla xwe bike ber bi min ve were  
 Ji ber bejna te ya zirav û delal  
 Can li min dilerizî  
 Dest û pî li min dîtevîzî  
 Qolinc û pişt li min diçerîsî  
 Wekî ku ez ji xwe derbas bûbûm

Hiş û mêjî di serê min de nemabû  
 Û li dora te çerx dibûm  
 Ling li min dişemitîn  
 Dil û pişk li min dişewitîn

Sewda ya ber dilê min  
 Min qûr qûr keser dikişand  
 Min hûr hûr hêsirên çavan dibarand  
 Ez mirovekî Rojhilatî  
 Xerîbim li vî welatî  
 Wek xerîbekî wînda bûyî  
 Lê ne li kolanan  
 Ne jî li bajarên  
 Bes di eşq û evîna te de  
 Di xezal û deleliya te de  
 Di bejinziravî ya te de  
 Di çavên te yên melûl de  
 Û di dilê te de wînda bûbûm

Sewda ya ber dilê min  
 Li te digeriyam  
 Li te temaşe dikim



Li te mêze dikim  
 Xwe dibînîm li ba te  
 Hey tu evîndara min  
 Hey tu hêvîdara min  
 Carekê li min binhêre  
 Xwe bibîne li ba min

Sewda ya ber dilê min  
 Di destê min de destmala kesik û sor  
 Direqisiyam li dawetan dor bi dor  
 Ji kevok û welatên li jêr û dor  
 Dipirsiyam û li te digeriya hawîrdor  
 Li serdalan  
 Li demsalan  
 Li havînan  
 Di germa qijilî de  
 Li zivistanan  
 Li ser berf û pûg a cemidî  
 Li biharan  
 Li ber bayekî darawis  
 Li payîzan  
 Di bin şilî û şepalî ya baranê de  
 Li te digeriya  
 Evîndara min  
 Hêvîdara min  
 Carekê were lê lê çira oda min ê  
 Bermalya min meke nazê  
 Tu yara min î dilsozê  
 Tu dilketiya min î berxa kozê  
 Carekê were li ser sîngê min razê  
 Sewda ya ber dilê min  
 Min tu di ber çavên xwe re bir û anî  
 Şiyar dibûn li min hêst û bîranîn

Xezalî ya te, delalî ya te  
 Kul û keder li min deranîn  
 Zarşîrîna min  
 Çavreşa min  
 Pordirêja min  
 Bejinzirava min  
 Ez mîna kevokek aştiyê dilbixwînim  
 Li ser te stranan dixwînim  
 Ez evîndarekî xizanim  
 Ez birîndarekî hozanim  
 Hevalê feqîr û belengaz û nezanim  
 Li ser deşt û çiya û zozanim  
 Axx ax! Tu li ku yî?  
 Sewda ya ber dilê min

10. 03. 2001, Stockholm

# Ji Dîrokê

## Berhevkar: Şoreş Reşî

*Di şerê Çaneqalê de, tenê ji gundî Buldix tam 40 kes dimirê. Gund wê demê 60 malê û ew jê derdexê meydanê ku me çiqes bedel dane...*

*Eldîna malê Alî Milê ji gundî Buldixe. Di şerê Çaneqalê da sê lawik û mêrê xwe dimirin. Ji wan xebêren reş şûnde, Ela me navê dînbûnê li ser xwe datîne. Her sibê li ber malê dewî dikayê û kilame distiranê. Li gund gîştikê le radibûnê sêre û guhdar dikirinê. Nizanim çend sala sirayê, lê di dawiyê de çavên wê qûr dibin û bi kulên wan jî dimirê. Ev kilama min ji se mêriyan berhêvkir.*

I

Divê dilê mino loo, tine tine loo  
 Ò biyê biroşa loo, ar li bine loo  
 Eza ji der de loo, ketim hundir loo  
 Mezkir se recalê mine loo, runiştinê loo

Ji min kû malî dîwê lo, gi malê minê loo  
 Min alê çiyê seferbirliga xopanê loo, li hêla minê loo  
 Divêm berxê berxê loo, Hesên berxê loo  
 Eza diçêrînim naçêrînim loo, nake ser xwe loo

Hesên berxê Gelîbolû dibên loo, cih-warkî tengê loo  
 Kurşûna wî kafirî kafirî loo, ê bê dengê loo  
 Hesên berxê seda rabûm loo, bîna bê te loo  
 Were şînga şînga loo, caniyê şê te loo

Eza hersê berxên xwe loo, bi xwe re bi heval kim loo  
 Min alê çiyê kafirê kafirî loo, di dû min te loo  
 Yê ku Hesên, Pişar, Osê loo, min nasnekê loo  
 Li serî fesa Osmaniyan loo, li navê şete Ecemê loo

II

Ew Pişare ew Pişare, li serî donegê dadustê tîremarê  
 Min got Pişar, Oso, Hes û Elo, sibe zû bîna bê te  
 Dengê deştiya (şehîd) yê li qûna çiyê te  
 Pişar Elo xwe bi yane kî din, kurşûna wî

kafiriyê sewa we te

Ew Pişare ew Pişare li serî donegê dadustê tîremarê

Min got eza gûl û sosina biçinim bi destê kim  
 Eza terlê biçinim bi fetle û çalxikim  
 Eza herim ji seferbiliga şevitî, ji Pişar û

Elê xwe re bi sîkim

Ew Pişarê ew Pişarê li serî donegê dadustê tîremarê

Min got Çeneqelê Çeneqelê, şûna avê xwîn dikelê  
 Pişar û Elê min natirsîn, di dest kurşûna  
 wî kafirî de ketin belê

Min got dilê mino pine pine, bûye biroşa ar li bine  
 Eza ji derda ketim hundir, se recalê minê rûniştinê  
 Min got qê malê dîwê gîştik malê minê  
 Ew Pişarê ew Pişarê li serî donegê dadustê tîremarê

Min got siwar siwar bûnê rahev ketin  
 Serê remê wan ê bi hevketin  
 Şerê giran bi xelkê şerîn, bi wan şere min dawetin.  
 Ew Pişarê ew Pişarê li serî donegê dadustê tîremarê

Mere mere Pişar, Oso, El û Heso mere  
 Qalê wî bêkarî dikin çiqas li dilî minê bi qarê  
 Wê hatiye deriyê wê qal û şerê  
 Eceb eceba Rawa Hemikê  
 Ji çar mêra yekî li malê xwe venagerê  
 Ew Pişarê ew Pişarê li serî donegê dadustê tîremarê

2002, Stockholm



# Metelok (Pêşgotin)

Berhevkar: R. Celîkan

- Av di korta da ma, ya geni be.
- Bajarî dûr, navî xweş e.
- Binî herde yî qul e. (Guçkê herdê ye qul in.)
- Bîr bi çatiya tiji nabe.
- Bûkê ser hespê, kes nizane qismeta kê ye.
- Dîna ne guneh e, xwûdanê wana guneh e.
- Dîn pir in, gi ne li arekê ne.
- Ga mir kêr ye lê pir bin.
- Xûn zail nabe.
- Xalan xelk in, Apan mulk in.
- Xelk zû di meriya derdixe.
- Kuçik bi qurma namirin.
- Qurmî darê ji darê nabe, dar wêng gêr nabe.
- Kuçkî bi zorê bişînî pêz, tu xêr jê nê.
- Mar ji pungê heznake ew jî tere ber poz diruzê.
- Ma tişteker ber dîna nekeve.
- Mêrkî qut nivî xwe di binî herdê da ye.
- Mêrkî zana mînê kelehê hesinî ye.
- Ne bi malî pir, ne bi gerdanî sor.
- Sirtî bizinê xurî, ye here nanî şivên buxwe.
- Sirtî kerê xurî, ye herê xwe di çoyî şivên bide.
- Te xêrik kir, bi dê-bav bike. (Te işik kir, bi dê-bav bike.)
- Te ji kê ra go, Rind e, Ew jî ye here di çavîyê gund da mîzke.
- Va dil e, ne kevçik bulxur e.
- Yê merîya ji merîya va xaynake.
- Yê qutê xweş e.
- Zikî pîzav xwarî ye bişewite.
- Kevrik ji şûnê xwe livî, carka din şûnê xwe nabine.
- Hespê çê qêmçî di xwe nagîne.
- Bexê çê li ber kozê bellî ye.
- Yê çê li qûnê qêdi nê.
- Rahêlê bûkê bi bûkê ra.
- Çêlê mara bê axû nabin.
- Yê ku dînik pê dizane heft paqil pê nizanin.
- Şêrê dêxin, rûvî ye buxwin.
- Dew brayê mêst e.
- Nanê bi nanê ye.

# Ö D Ü L L Ü B U L M A C A

Hazırlayan: Mustafa Görkem

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14	15
1															
2															
3															
4															
5															
6															
7															
8															
9															
10															
11															
12															
13															

Bulmacamızı doğru olarak çözüp adresimize gönderen beş okurumuza sürpriz hediyeler veriyoruz.

Adres:  
M. Alpavut  
Friedhof Str. 3  
47877 Willich  
Deutschland

**SOLDAN SAĞA:** 1/ İç Anadolu'da bir Kürt köyü 2/ İstihsal – kar fırtınası – iskambilde koz. 3/ Bir harfin okunuşu – (Memduh ..) film yönetmeni – mercek camı – Su ile yoğrulmuş un 4/ Ali yanlısı – bir işi yapmaya hazır. 5/ Kürtçede kölelik – güvenilen, emin - araçlarda bağlantı çubuğu 6/ Denizcilikte bir rütbe - Bölmeli göçebe çadırı – tabur (kısaca) 7/ İlaç - büyükler, ileri gelenler - Basklar'ın özgürlüğü için mücadele veren örgüt 8/ Doğu - boyna takılan ziynet eşyası - yetersiz. 9/ Güreşte bir oyun – Avrupa Ekonomik Topluluğu (kısaca) - ticari eşya – Kürtçede bilye 10/ İç Anadolu'da bir Kürt köyü - Bir peygamber – yükselme. 11/ Bir harfin kalın okunuşu – Kayak – Kars yakınlarında tarihi bir kale – maksat, amaç 12/ (... Tigran) Ermeni asıllı Bir ozan - bir renk – bulgur ya da pirinçle yapılan bir yemek 13/ İç Anadolu'da bir Kürt nahiyesi – bir alay işareti.

**YUKARIDAN AŞAĞIYA:** 1/ İç Anadolu'da bir Kürt köyü 2/ Vücuttan atılan azotlu madde – Tekirdağ'ın bir ilçesi 3/ Bir harfin okunuşu – Kürtçede bayrak - geri çevirme - namus 4/ Ütü yapmak – üzüm dalı 5/ Bir bilim dalı - sevgi. 6/ Eski Alman parasını simgeleyen harfler - viran olmuş - dolaylı olarak anlatma 7/ Lityum'un simgesi - Su (eski dil) – boru sesi – ateş. 8/ Maden Tetkik Arama (kısaca) – kemik içindeki yağlı madde - tutarık 9/ Gemi sığınağı – edebiyatta bir tür 10/ Avrupa Parlamentosu (kısaca) – Çinli bir lider – bir nota – kalın sicim 11/ İç Anadolu'da bir Kürt ilçesi – Kürtçede cuma günü 12/ İsim – Tanrı tanımaz – elbisede kullanılan bir parça 13/ Ay – Arnavutluk'un başkenti 14/ Yazıklar olsun anlamında bir ünlem – küçük bitkilerin genel adı – aile ile ilgili olan 15/ HADEP genel başkanı olan, İç Anadolu politikacı.



# İÇ ANADOLU KÜRTLERİ TARİHİNDE ÖNEMLİ BİR ARAŞTIRMA!..

**VEGER'in 2. sayısında  
İç Anadolu Kürtlerinin tarihinde  
bugüne kadar bilinmeyen  
bir ilki açıklıyoruz.  
İlgiyle okuyacağınıza inandığımız  
araştırma yazısını  
mutlaka okumalısınız!**



